

PIRS

Pêrist

Kovareke
Rewşenbîrî
Serbixwe ye

Hejimar:38
Havîn: 2007

Biha:50 p.s

Pêşgotin -----	2
Gotina kovaran -----	3
Di Bîranîna 109 saliya -----Konê reş	5
Rewşa jinan li Îranê -----Zîna Şikakî	8
Mem û Zîn -----Rizgar kurdaxî	15
Hevpeyvîn-----Pertewê Şerqî	19
Zimanê dilê min -----Mürüvet	22

Çêrok

Ciwanî û kalî -----Îvan Bûnîn	28
Erebok -----Î.Gabar	32

Kelepûr

Mihemedê Gavan ---Samî Ehmed Namî	33
Pirjinî û belayên wê ----Osman Sebrî	40
Hevgirtina reşenbîrên rojava li derve	43
Ji pêkenokên rast -----Zamdarê Zindî	45

Helbest

Dêm qurnefîlê -----Merwan Berakat	46
Birîn -----Edonîs	48

www.kovarapirs@yahoo.com

Cejna Rojnamevaniya Kurdî

Xwendevanên bi rêz...

Bi hatina roja 22ê Nîsanê, 109 sal di ser derçûna yekemîn rojnameya kurdî re di dîroka me ya nûjen de derbas dibin. Di vê roja pîroz de ji sala 1898an, Mîr **Miqdad Midhet Bedirxan**, rojnameyekê bi navê "**Kurdistan**" bi zimanê kurdî li Qahîrê diweşîne, bi gelên cîhanê serûber dide zanîn, ku li devera rojhilata navîn, miletek bi navê kurd heye, xwedî ziman û dîrokeke taybet e, ew ne li ber şapê yan lehiyê hatiye, lê belê, ew li ser xaka bav û bapîrên xwe ya dîrokî dijî, ziman, çand û folklorê wî ji ya gelên cîhanê ne qelstir û kêmtir e.



Mixabin, piştî belavbûna rojnameyê, ewa ku dilê gelê me pir şa kiriye, çavê karbidestên dewleta **Osmanî** di serê wan de sor bûne, hêrs û hêç bûne, biryara rawestana wê dane. Lê, bi saya vîn û berxwedana xwediyê wê, paşê jî birayên wî, rojnameyê serî ji biryara **Sultan Ebdulhemîd** re neçimandiye, li ber xwe daye, 31 hejmar jê hatine weşandin û ji kurdan re bûye stêrkeke geş û ronak, tariya nezanî û paşketinê taromar kiriye, rêya rast û durust li pêşiya gel dûz kiriye.

Bi vê helkeftina giranbuha û pîroz, em pêwîst dibînin, ku rewşenbîrên kurd bi hestekî berpirsiyare, bi erk û stubariya xwe rabin, li rewşa çand, wêje û zimanê kurdî xwedî derkevin, hemî mil li mil, dest bidin hev, ji bo bilindkirina asta zimên, ji dil û can de kar û xebatê bikin.

Di vî warî de, em hevkarî û danûstandina erênî di navbera desteyên kovar û weşanên bi zimanê kurdî de yên li Sûriyê têne weşandin, bilind dinirxînin, gotina wanî hevbeş di bîranîna 109 saliya rojnamegeriya kurdî de, mizgîniyeke xweş û hêja dibînin, û ev xebat cihê rêz û rûmeta me ye.

Hêvî û omîda me ew e ku ev têkilî û danûstandin bi demê re berve peydakirina dezgeheke rewşenbîrî herin, ewa ku di paşerojê de karibe nûnertiya hemî rewşenbîr û berketiyên zimanê kurdî li Sûriyê bike, herwekî nas e, rêya dûr û dirêj bi gavekê dest pê dîke!!

Li dawiyê, careke din, em cejna hemî rewşenbîr, rojnamevan û xwendevanên kurd pîroz dikin, hezar silav li giyanê Mîrê gewre **Miqdad Bedirxan** û hemî xebatkar û xemxarên ziman û wêjeya kurdî.

Desteya kovara PIRSÊ

Gotina Kovarên Berpirsiyar Di Bîranîna 109 Saliya Rojnamegeriya Kurdî De

Em, bi navê kovar û rojnameyên Kurdî yên li Sûriyê têne weşandin: (**Aso, Jîn, Hevind, Deng, Gelawêj, Newroz, Perwan, Pirs, Roj, Vîn**), û bi navê **komîta fêrbûna zimanê Kurdî, komîta Celadet, komîta çalakiyên kurdewarî**, û wilo jî bi navê hemî piştgir û hezkirên ziman, rojname û rojnamegeriya Kurdî, vê bîranînê li xwe û li we pîroz dikin.

Bi helkeftina vê bîranîna pîroz, bîranîna 109 saliya rojnamegeriya Kurdî, em dibînin ku kovar û rojnameyên binavkirî pêma û berdewamiya rojnameya Kurdistan in û nivîserên wan pêma û berdewamiya rewşenbîriya Kurdî ne, ew in yên çapemeniya Kurdî, di demên serwest de hambêz kirine û hambêz dikin, û hêja ne ku nûnertiya rojnamegeriya Kurdî li Sûriyê bikin.

Bo vê yekê, em wî mafi didin kovarên xwe, didin nivîser û xwênerên van kovaran, ku ew in xwediyên rastînkî ji rojnamegeriya Kurdî re li Sûriyê, û pêşdeçûna rojnamegeriyê ji wan tê xwestin û bi wan nîşan dibe.

Loma, em bi hêvî ne, ku bîranîna 109 saliya rojnameya Kurdistan(roja rojnamegeriya Kurdî) bibe zîlana rolaskirina rewşenbîrî û hêzeke xort di riya çesandinên resen û petî de. Da em, bi hev re, desthilata avakirina weşaneke şûngirtî bin, û pirsên rojnamegeriyê di çerxeke ronî de bigerînin, da xameyên me bibin neynika pirsên civaka xwe û bi erkên rojnamegeriyê rabin, desthelata vejîna kevnetoreya xwe bin û karibin civaka xwe ber bi banbilindiyeke mirovane û şaristane de bilivînin.

Bêgoman, em pileya rewşenbîrî û rojnamegeriya

Kurdî li Sûriyê, di astengiyeke berbiçav de dibînin. Loma, gotûbêj û gengeşên rojane bi mebesta çareserkirina vê pirsê li dar in. Ev guftûgo hewildana pileya bîrgeşî, têgihiştin û rolnaskirina rewşenbîrî dikin, da faktorên banenizmî, bêkêrî û bişûndemayîna civaka xwe dorpêç bikin, û rola berdewamiya van mercên bêkêr ji holê rakin.

Ev danûstandin û hewildan, di behweriyên me de, wê bibin gavavêtineke giranbuha ber bi pelandin û çareserkirina piraniya astengên demane, yên ku xwe li dora zîlana rewşenbîriyeke resen radipêçin û nahêlin ku rojnamegeriyeke serbixwe û şûngirtî bimeye û cih bigre. Wilo jî, em dizanin ku gelek mercên derveyî desthilatdariya rewşenbîriya Kurdî li Sûriyê me di bin bandora xwe de digerin û dibin sedema sereke ji neşûngirtineke rojnamegerî re. Ji van sedeman: neyîniya pergal û yasayên rêdaneke

serfiraz ji çapemenî û rojnamevaniyê re, binçavkirina hemî kiryarên serbixwe ji hêla rejîmê ve, raspêriya hêzên ewlekariya rejîmê di warê raxistina bîr û behweriyên rewşenbîrî de, di warê bidestxistina desthelatdariyeke eborî de, di warê mafdariya bidestxistina dezgehên weşan û belavkirineke serfiraz de, di warê hebûna alavên rûdaneke rewşenbîriyeke serfiraz û bê kontirol de...û di gelek warên din de.

Lêbelê, bi ser van kul, derd, êş û azeriyan de jî, em bi hêvî ne ku wê dem gerş û gemara xwe bi xwe re bimale... û ev bîranîn li ba kovar, nivîskar, çalakvan û rewşenbîriya Kurd bibe gaveke pîroz di hewildana avakirina çapemeniyeke bi rûmet û hêzdar de û bibe durv û nîşana civakeke durust.

Hersal cejna rojnamegeriya kurdî li we pîroz be!

Komîta Kovarên Berpirsiyar

DI BÎRANÎNA 109 SALIYA ROJNAMEGERIYA KUDÎ DE

Konê Res

Bi helkeftina bîranîna 109 saliya rojnamegeriya Kurdî, komîta berpirsiyar a kovar û rojnameyên Kurdî, yê li Sûriyê tene weşandin, di roja 18/04/2007an de daxuyaniyek deranîn û di medya kurdî de belavkirin ku ew, xwe dibînin ji pêma û berdewamiya rojnameya Kurdistan di Binxetê de.

Vêca bi vê helkeftinê, ji 18 meha nisanê ve çalakiyên pîrozkirina vê rojê li tev herêmên kurdan, di Binxetê de, bi semîner, şahî, seyran û bilindkirina wêneyên mîr Miqdad û mîr Celadet hat li darxistin...

Wek ku diyare ji sala 1968/1970 î ve, her sal di seranserî kurdistanê de bîranîna rojnamegeriya kurdî di roja 22 Nisanê de, bi semîner, şahî, seyran û lêkolîn tê lidarxistin. Ev roja ku mîr Miqdad Midhet Bedirxan li Qahîrê paytexta Misirê yekemîn rojnameya Kurdî bi navê-Kurdistan-di roja 22 nisana 1898 an de weşandiye û

wiha ev roj bûye roja zayîna rojnamegeriya Kurdî.



Di vê rojê de jî, tev kurd li ser yek in, mîna roja Newrozê, mîna gotinên sirûda netewî ya kurdî Ey Reqîb, û mîna Ala Kurdî.

Isal li (Binxetê) gelek aheng, seyran û şevbuhêrk hatin li darxistin, ji tev salên derbasbûyê bêtir.. gelo sedem çî bûn ?!

Hilbijartinên parlamentoya sûriyê bûn, a ku ket eynî rojê (22 nisanê), û bû derfetek ji rewşenbîrên kurdan re.. An çavgirtinek bû ji rêjîmê ku, hilbijartinên xwe li gor kêfa xwe di herêmên kurdan derbas bike..?! An bi rast û durist kurd şiyar bûne û nahêlin ku roja wan a rojnamegeriyê bê aheng û seyran derbas bibe ?

Sebarefî min, her ku ez Hawarê, Ronahiyê an Roja Nû dixwîn im û berpêl dikim, tiştina nû di nav rûpelên van kovar û rojnameyên ku Bedirxaniyan bi dûv xwede, ji me re hiştine,

dibînim. Vê carê, mamoste Bavê Dara, ez agahdarî vî gotara mîr Celadet Bedirxan kirim, ev gotara ku di rojnameya Roja Nû de hatiye belavkirin.

Di vî gotarî de xuya dike ku Bedirxaniyan bi şêwir kovar û rojnameyên xwe diweşandin û piştgiriya hev dikirin.. Hem ku ti rojname berî rojnameya (Kurdistan) a ku Mîr Miqdad Midhet Bedirxan li Qahîre diweşand, nehatine weşandin... Hem jî ku Mîr Emîn Alî Bedirxan piştgirekî sereke bû ji birayê xwe Midhet Beg re dema ku wî rojnameya xwe Kurdistan li Misrê çap dikir...

Û her wiha di derketina rojnameya Roja Nû de mîr.Dr. Kamîran Bedirxan ji birayê xwe yê mezin mîr Celadet û hin din dixwest ku ji rojnameya wî re binivîsîn. Û wiha di hejmara pêşîn de mîr Celadet gotarek bi navê (Merhele) nivîsandiye, di hejmara didiwan de Osman Sebrî gotarek bi nave(Sinc û Ol) nivîsandiye û di hejmara sisyan (Duşemb, 17 Gulana 1943) de ji rojnameya Roja Nû careke din ev

nivîsa mîr Celadet Bedirxan hatiye belav kirin.

Belê di vê nivîsê de Mîr Celadet hin ji pêwendiyên bavê xwe Emîn Alî û mamê xwe Midhet Beg diyar kirine, dema ku mamê wî Midhet li Qahîre rojnameya KURDISTAN çap û belav dikir, hem jî bersiva bavê xwe Emîn Alî ji mamê xwe Midhet Beg re, di nav vê nivîsa xwe de belav kiriye.

Ji ber giringiya vê nivîsê û hatina 109 saliya roja



Rojnamegeriya kurdî, min jî xwest ku ez çavên xwendevanên kurd, bi van gotinan kil bikim.

Fermo, ev e nivîsa ku Mîr Celadet Bedirxan ji birayê xwe Dr. Kamîran re şandiye û di rojnameya Roja Nû hejmara 3 an de hatiye belavkirin:

1943 - 1898

Roja Me A Nû

**Xwediyê Roja Nû ji min hejmara rojnama xwe a
û ji hinên din, ji bo pêşîn nivîsarin xwesti**

Pirs - hejmar - 38 – rûpel 6

bûn. Min jê re bendek nivîsand; lê beriya ko qala rojnamê bikim benda min gîhandin dawiyê û xistin rojnamê û jê re (Merhele) gotin.

Herçî ez, dilê min hebû, çavên xwe li boriyê bigerînim û bîrekê bav û mamekî xwe, bi vê hencetê vejînim.

Rojnama Kurdî a pêşîn berî 45 salan, yanî di sala 1898 an de, li Misrê belav bûye: Di wê salê de mamekî min Midhet beg di Qahîrê de bi zimanê

kurdî rojnameyek derêxist: Kurdistan.

Kurdistan rojnama Kurdî a pêşîn e.

Welê dixuye ko hingê, Midhet beg, ji birayê xwe ê mezin, Emîn Alî Beg, yê ko hingê li Stenbolê bû, nivîsan xwestî bûn. Emîn Alî beg ji birayê xwe ê kiçik re, di nav nivîsarine din de, teqrîzek jî rêkiribû, lê ne bi navê xwe, ji ber ko nikarîbû, lê belê bi navê (Lawê Ş E. Fetah).

Ev e teqrîza bavê min;

*Pêrûz ji te re hezar cara
Ev deng e niho li nav yara
Mizgîniya vê cerîdeya qenc
Şabaş bitin çîqa hebit genc
Ev şixlê mezin te kiriye bideet
Cara ewilî te kiriye him-met
Ev rehbera qenc te danî
binyad
Kirmanc hemî te kirne irşad
Vê marîfetê tuca nehêle*

*Daim ji te re mîin resûl e.
Roja ko cerîde tête bajar
Her der dibitin mîsalê bazar
Çîqa hebitin li şehî Ekrad
Qewlê xweşîya te kirne mitad
Rûhaniya bab û kal û ecdad
Pê vê hinerê te kir niho şad
Beybûniya dewleta te geş bit
Qasî tu hebî dilê te xweş bit*

Xwedê rehma xwe li wan û li hemî Kurdên ko, xêzek be jî, bi kurmandî nivîsandine bikit.

C. A. BEDIR XAN

Rewşa jinan li Îranê

Zîna şikakî - Parîs

Heştê Adarê fersendeke ku bal were kişandin ser rewşa jinan, ka çi ji wan tê xwastin û çi ji wan re divê ?.

Roja şemiyê 03 Adara 2007 an, **Fédération Navnetewî ya Jinên Cîhanê**, cejna jinên cîhanê li Qesra Kongreyan li Parîsê kir. Naveroka projeya îsal li ser pêkanîna wekheviyê di navbera jinan û mêran de bû, û xebata li dijî olperstiya ku kirinên hovane dajo ser jinan.

Di civînê de gelek jinên navdar hebûn, seroka Fedrationê xanim Elîzabet Sêdnî, ji netewa xwe de Inglîzî ye, gotina destpêkirinê xwand. Wê bal kişand ser wekheviya bi mêran re, ji ber ku li Ewropa, sala 2007 an wek sala «**wekheviyê**» hatiye binavkirin.

Hat diyarkirin, ku 2/3 ji kesên ku nizanin bixwînin û binivîsin jin in.

Li Îranê, di sala 2006 an de ,1000 jin hatine bidardekirin û bi hezaran di zêndanan de hene; serçavên gelek jinan hatine sutandin û şefrekin, tenê çima

ew xwe mêkyac yan xwe serqot dikin. Çûn û hatina jinan bi hesab e, rengê cilên wan û awayê li xwekirinê bi kontrol e.

Li seranserî cîhanê, lêdana jinan, erzankirina wan bi gotinên kêr û ne xwaş dibe, çi keçik çi jin, hîn bi darê zorê tene kirin û firotin, zewaca bê hezkirin û bi darê zorê hîn heye, jina ku xeber û lêdanê jî nexwe, ji bihîstina çîrokên rengerengî nafilte û di jiyaneke bi tirs de dijî. Yanê jin bindest e.

Di Kongira Pêkîne paytexta «Çînê» ya sala 1995 an de biryar hatibû standin, ku xebat li dijî van kirên nemirovane were kirin û salên dema lêgal ya zewaca keçikan ne di bin 18 salan re be, ji ber ku berî 18 saliyê keçik ne di warê mejî û ne jî tindurstî de amede ye barê avakirina malekê hilgire.

Li seranserî cîhanê, divê weke hemû mirovan ev mafên jinan yên li jêr werin naskirin, bi destxistin û parastin:

- Mafê berendamtî û dengdayîne di hemû rengên hîlbijartinan de hebe û li ser

destûr were çespandin.

- Mafê kar û azadiya vebjartina wî. Û mafê wê di hemû asteyên berpirsariyê de hebe ta bighêje seroktiya dewletê... û h.w.d.

- Mafê birêvebirina xebatên politîkî, civakî û çûnûhatinê bêyî rêdana tu kesî.

- Mafê lixwekirina kincan li gor zewq û daxweza xwe.

- Mafê bikaranîna hemû meraqên wê, bêyî ku were pelxandin, mîna karên artistîk, sport, kûltûr, û mîna mêran dakeve meydana pêşbirkan.

- Divê ku komelên jinan werin naskirin û pişt giriya wan were kirin.

- Divê newekheviya di hemû warên jiyane de, civakî, kûltûrî, aborî were naskirin, û rakirin.

- Wekheviya mi'aş li gor wekheviya kar were danîn.

- Di dema avisî, zarokanîn û tîmarkirina derkûşan de, mafê mi'aş û rêdana bi pere were çespandin.

- Mafê wê di hibijartina hevalê jiyana xwe de, û di zewaca bi erêkirina herdu seriyan keç û kur de were çespandin.

- Mafê wekheviyê di hevduberdanê de hebe. Divê herdu serî sedemên jihevduberdanê wek hev li hember hev diyar bikin.

Pirs - hejmar - 38 – rûpel ----- 9

- Divê dewlet, di rêya sîstema civakî re, alîkariya aborî ya jinên bê mêr, bê kar, û bê zarok bike.

- Rakirina newekheviyên di warê şahidbûn, berpirsariyê û xwdîkirina zarokan û weresê de Di nava malê de, rakirina zor û lêdana mêr ji jinê re.

- Qedexkirina zewaca bi bêhtirî jinekê re.

- Qedexkirina hemû rengên pelxandinên cinsî, bi hemû rengên wê.

§ Kurte nêrînek li ser Rewşa jinan li Îranê :

Li Rojhilata navîn, jiyana jinê jiyaneke bi êş û west e, bi taybetî jî li Îranê. Ji 28 salan de rêjîmeke olperest li ser textê dewletê ye; %30ji jinên bi dîplom bê karin, %60 ji karên ku jin karin bikin, çênabe bi dest wan kevin; bikurtî Îran bûye zêndaneke mezin ji jinan re!

Ka em çend gotinan li ser rewşa jinan li ev welatê ku rojekê ji rojan kaniya kultura rojhilatê bû bêjin, û em binêrin va îro çi pê hatiye û gîhaye kîjan pileyê.

Li Îranê ji bona bidestxistina mafên xwe yên mirovane, serhildana jinan ya yekê ji bêhtirî sed salî de bû. Di sala 1895 an de di «serhildana tutûnê» de, jineke bi navê “Zêneb Pacha” heft

komên jinên bi çek yên bazarganên tutûnê li hemberî destlatê liber xwe dan, ji ber ku hukumeta Îranê ya wê demê dixwast kirin û firotan tutûnê bide destê şirketa «Rejî» ya inglîzî be.

MORGAN Shuster şewirmenda hukumeta Emrîka di pirtûka xwe «L'étranglement de la perse» «fetsiandin Farisan» dibêje: «*ji sala 1907 an de jinên îranî serxwetirîn jinên dunyayê bûn. Di 29 yê çirya pêşin sala 1911 an, 50 hezar mirov daketin girêveke gelemper çêkirin, ji nav wan sêsed jinên bi kincên reş û fereh, ser-çav girtî, çek di bin cilên xwe de veşartibûn, xwe li deriyê perlemanê xistin û derbasê hundir bûn, peçên ser çavên xwe çirandin, û tehdîd dan wan berpisiyaran ku ewê bav, bira, û mêrên xwe bikujin, eger ew perlemantêran nebin piştgirê azadiya gelê xwe».*

jinan ji bona avakirina bankên netewî, zêr û çekên xwe firotin, li şûna alîkariya dewletên xerîb! jinên Îranî, li Ezerbîcanê, li Tebrîzê jî ketine refên berxwadanê, cilên mêran li xwe kirine û bi dehan ji wan canê xwe feda kirin.

Bi daxwaza jinan, dest bi avakirina dibistanên keçikan û nexwaşxanên jinan hate kirin. Li Tehranê di sala 1910 an de, 50

dibistanên keçikan û bi dehan jurnelîstên jin ku di kovarên jinan yên rojane de dinvîsîn hebûn. Xanima Shuster dibêje: «*Eynî salê, li Tehranê 12 komelên jinan çê bûn. Wan jinan xebatên siyasî û civakî yê cûrecûre dikirin*». Lê mixabin civaka fewdal, têkiliyên aborî û civakî, dihîştin di sala 1906 an de, mafê rêdana hibijartinan ji jina were hilaîn!

Di sala 1920 an de, dema RIZA Xan bi alîkariya Înglîz hat ser textê dewletê. Wî pêşketina civakê di rêya avêtina şerpê re didît û biryar da ku keç û jinên Îranê serqot bin, lê wekî civak ji kûranîyê de ne amede bû, hejmara keçikên xwandekar ji 3467 an di deh salan de dakete 1710 an!

Sala 1952 an, dema MUSEDEQ bi alîkariya Emerîka û Înglîz tê ser hukum. Jinên Îranî bi saya wî hin mafan bi dest dixînin, tebaxa 1953 an jin mafê hibijartnên şaredariyan (bajaran) distînin. Destûra parastina civakî tê îmze kirin, wek mafên wekhviya jin û mêran, îcaza zarok anîne, alîkariya kesên seqet û heya bighêje jinên bê mêr jî . loma jî jin hemû dibûn pişt girê wî.

Piştî ketina Musedeq ji ser darê hukum, û ji bona razîkirina Emrîkanan, Şah radibe pir

guhartinan di derheqê jinan de tîne meydanê, wek rêdana mafên hîlbijartinê, parstina famîlê, wekhevî di hevduberdana jin û mêr de Wî dixwast jin bêhtir dakave nav civatê û kar bike û Temenê zewaca keçikan hilda heya 18 salan., Piştgiriya jinan bi şah gerek bû ku Îran bighê pileya «Civaka gewre».

Di wê demê de piraniya miletê Îranê ji qadên belengaz bûn, li sala 1976 an, tenê 26% ji jinan li bajêr dijîn, 3,4% ji jinên gundî xwande bûn, li hemberî 49% ji jinên bajarî. 87% ji jinan bêkar bûn li hemberî 23% ji mêran. Li bajarên her 2000 mêr tuxturekî wan hebû, li hember her 8000 jin. Li gundan her 20000 mêr tuxturekî wan hebû lê her 55000 jin tuxturekî wan hebû.

11 şibata sala 1979 an şah ji ser darê hukum tê gêrkirin û XUMEYÎNÎye ku li Parîsê, rûniştibû tê ser hukum, ji wê hîngê de barê jinên îranê, di gel wan jinên kurd jî, girantir dibe!

Ji wê rojê de û ta îro, li Îranê û li Kurdistanê, rêjîma melan li ser bîngeheke newek-heviya jin û mêran radibe. Bi ya wan be mêr her di ser jinan re nek !.

Serokê wan yê berê EKBER Haşimî Rafsançanî dibêje: «Newekhevîya fîzîkî, bejin, xortbûn, deng, serbixwebûna di navbera mêrekî û jinekê de dide

xûyan kirin ku mêr di hemû waran de ji jinan xortir, serxwatir û jêhatîtir in.. hiş û mejiyê mêran jî mezintir e. Ev newekhevî dihêlin mêr bibin berpirsyar, xwedî kar û bar û xwedî maf».

MORTEZA Motaharî dibêje: «Jin hemû hezdirin werin ajotin.....bi serketina mêran ya olî di ser jinan re di rêya dayîkan re derbasî keçikan dibe....her çi be jî, çend jin dixwazin li hember vê rastiye rabin, û eger ew ber xwe bidin ew şaşin. Jin divên ji vê rastiye re serê xwe dînin. Mêr ji bo wan gerekî da ku jiyana wan kontrol bikin, ji ber ku jin gelekî jar û his tenik in....» ew dibînin ku jin milkê mêra ne, çimkî mêr di ser jinan re ne, weke çawe Xwedê di ser mirovan re ye.

Mele eşkere, bi dengê bilind diqîrin: «Wacibê jina yê rewa ew e ku jin di bin gotina mêrê xwe de be, ketina jinê bin şora mêr, weke ketina bin şora Xwedê ye».

Di enalîza olperestan de, jin di jiyana civakî de weke kesên di pileya duwemîn de ne, ne dikarin, ne jî ji mafê wan e ku ciyê xwe di pêşbiriye de bibînin, çî di rêvebirina dewletê de, çî di dadmendiyê de, û di her karekî berpirsariyê de, heya dibêjin: «Divê dev ji jinan were berdan, werin îhmal kirin heya ku

bikaribin wan di bin şora xwe de bihêlin».

MUHEMED Zazdî yek ji kesên ku ji Xûmeynî ve nêzîk bû, û paşê di meclîsa çavlêgerandina (payanê) ya tevî sert û hişk, dibêje: «*Di muslmantiya ku em têdigihên û bi kar tînin de, em têdigihên ku du kar ji bo jinan qedex ne, yê yekemîn ku jin bibe serokê dewletê, ya diwemîn jî çênabe jin bibe dadmend (qadî), her ku çiqas pileya zanîn, aqilmendî û jîrbûna wê bilind be jî, ew ji bona van herdu karan ne girîngin! Lê her tu carî mafê jinan nîne ku van herdu karan bikin*». Û dibêje: «*Eger mirov ne mecbûr bûya tenê li pêş Xwedê kabveda, gerek bû jinan li pêş*

Rêcîma melan rabû qanûnên medenî di derheqa mafên jinê de biderxistin, wan ew bindestiya jinan di warên civakî û siyasî de bêhtir resmî kirin, tara bêjingê li serê xwe teng kirin û serê jinan xistin bin 'ebe û peçan. Tarîbûn û reşbûna hiş û dilê wan ne bes bû, rabûn dunya jî li pêş çavên jinan kirin reş û tarî, kolanên şên, ezmanê şîn, deştên xemilî, runahî û kenê însanan, bêhna xemgîniyê bi ser xistin! însan hemû li hemberî hev kirin qeşmer!

Morteza Motahharî dibêje:

- Li gor rêya mafên jinan di Îslametiye de: *Mafê hevberdanê (Telaq ê) tenê di destê mêran de*

malxuyên (mêrên) xwe kabvedana».

Di aydyolociya wan olperestan de, ne mafê jinan yê hilbijartinê, ne karên polîtîkê û ne jî yê civakî hene, ew tenê bûne koleyên mal û malxoyên xwe!

Xûmeynî di sala 1962 an de bi dijarî li hemeber mafê jinan bi hilbijartinê sîkinî. wan «*maf dan jinan ku tenê di bîroyan de kar bikin, bîroyên tenê ji bo jinan, ew têde hatibûn cemdandin, û karên bê havil dikirin, herwiha bila jin tim li bin bin û bi ser nekevin! di bin serokî û şora mêran de bin*».

ye: «*ger mêrek jina xwe neqewtîne, divê ew jin her ji wî re dilsoz be û jê hez bike, herwiha biryara heduvberdanê xistiye destê mêr*».

Ji ber vê yekê paqijtirîn hezkirin, hezkirina jinê ji mêrê xwe re ye, divê jin hemû keda xwe bike, ku mêrê xwe razî bike, çimkî rih, can, laş û hisên wê heya bi nifûsa wê jî milkê mêrê wê ye, û ew bi navê wî tê bi nav kirin û tê nas kirin. Ji bona jinê mêr cihê Xwedê digre, ev yeka hanê li dijî fikra Îslametî û yekêtiya Xwedê ye! ew ji Quran, û şerî'etê derbasî çîrok û efsanan bûne. Bo numûne ew dibêjin: Dema hizretî Pêxember vedigere

buhîştê (jêder : **Hayat al Qoloub** ya mela Muhamed Bagher Majlessî), dibeje: «*min dît ku jinek bi porê wê ve hatibû bi darde kirin û mejûyê wê dikeliya, ji ber ku wê ser serê xwe negirtibû. Û min jinek din dît, ku bi zimanê wê ve hatibû bi darde kirin, û ava kelî ya cihenimê berdidane gewriya wê! ji ber ku wê mêrê xwe hêrs kiribû, û min yeka din jî dît, bi lîngan ve hatibû bi dardekirin ji ber ku bê destûra mêrê xwe ji mal derketibû....*».

§ **Dijîtiya jinan di destûra melan de:**

Tevî di destûrê de tê gotin ku hemû mirov li pêş qanûnê wek hev in û qanûn mafê jinan diparêz e, mîna di van du bendan de :

- **Bend 20**

Her endameke civakê, çi jin, çi mêr, wekhev in, qanûn wan diparêze û mafên wan yên mirovatiyê dinase, çi mafê politikî, aborî, civakî û çi kulturî be, ew tev li gor şert û şirûtên islametiyê!

- **Bend 21**

Divê ku rêjîm mafên jinan li gor şertên islametiyê piparêze!

Lê belê bîngeha yekemîn a dijîtiya jinan di destûra Cîmhûriyeta Îslamiya Îranê de

li ser gotinên welî, feqeh û berpîsyarên olî yên ku bi emrê Xwdê destûr û qanûnan datînin e. Wek ne ji mafê jina ye ku bibin serokên dewletê, ne jî bibin dadmend.

Kurte nerînek li ser çend bendên qanûna medenî ya rêcîma Îranê:

Qanûna Cezakirinê:

- **Bend 102:**

Kuştina bi kevirkirinê. Cezakirina jin û mêrê ku xiyanetiya cinsî bike, ya mêran heya bi navê û ya jinan heya bîncengan (ser memikan) dixin axê û bi lêdana keviran tene îşkence kirin.

- **Benda 104:**

Kevirên bi kar tên divê ne pir girs bin, da ku bi kevirê yekemîn re nemrin, û ne jî pir biçûk bin, da ku navê kevir di cî de be. «armanc ji girsiya kêvir ew e ku gunehê wan bi êşekê were rakirin.

Ictîhad: «Mêrê ku jina xwe bi çavên serê xwe di xayinetiya cinsî de bibîne, dikare wê jî u yarkê wê jî bikuje , bê î ku were ceza kirin! Hema mafê jinê nîne ku li mêrê xwe wiha bike! Yariktiya di nav bera mêr û jinekê de ger negîhabe têkiliya cinsî, cezakirina wan 99 şivikin (lêdanên bi şivkê ne).

«Jinên li derveyî malê di nav civakê de xwe baş nepêçayî (can û serî veşartî), ji 10 rojan heya 2 heyvan têne binçav kirin û 74 şivikan duxwin , yan jî vêrgiyeke ji 5000 heya 50000 (divîsê îranî dide).

- Benda 300

Buhaya ceza xwîna (diyeta) kuştina mêrekî du caran li ya jinekê ye.

- Benda 209

Ger mêrek jinekê bikuje, divê xudanên wê bi giraniya nîvê buhaya xwîna wê bidin xudanên mêrik, heya karibin di rêya qanûna medenî re wî merî bidin dadgehê û Qîsasê bikar bînin.

- Benda 258:

Ger jinek mêrekî bikuje, qanûna Qîsasa bidarvekirinê li wê dikeve, bêyî ku buhaya xwîna were dan. Di cerîmeka namûsê de, ger mêrek bibe sedema mirina jina xwe, ew mêr nayê cezakirin! Hema ne ji mafê jinê ye dilsoziya jinûmêritiyê ji mêrê xwe daxwaz ke.

- Benda 237:

Şihada (rastdîtin, rastgotin)a mêrekî, li hember a du jina ye. Heya di serpêhatiyên kuştinê yên

eşkere de jî wilo ye. dema ku mêrek lêdanên giran li jina xwe bide û birîn bike, qanûn destûrê dide, çiqas birîn kûr û giran bin jî, ceza sivik! (her wekî me li jor jî da xûyan kirin ku ne buhaya xwîna wan, ne jî giraniya gunehê wan yek e). Ger bavek, an bavpîrek keça xwe an neviya xwe bikuje, ew tenê buhaya xwîna wê dide û ne ji mafê diya keçikê ye bibe dozdarê kuştar û cezakirina mucrîm bixwaze.

Keç di neh saliyê de li pêş qanûnê perpirsyar e û weke jina tamam û navser tê cezakirin. Hema kur di panzdeh salî yê de .

- Benda 223:

Dema mirovek cahilekî bikuje, ew bi Qîsasa bidarvekirinê tê dadkirin, hema ger bav be an bavpîr be, ew tê bêgunehkirin. Eger jinek gunehkî wiha bike, ew yekser bidarvekirinê tê cezakirin !

- Benda 220:

Bav an bavpîrê ku zarok an neviyê xwe bikuje, li şûna bidarvekirinê, ew buhayê xwîna wî dide. Eger jinek gunehkî wiha bike yekser ew bidarvekirinê tê ceza kirin.

• Pêşgotin

Ehmedê Xanî helbestvanê Kurdan yê netewî ye. Ew di sala 1651 de li navça Hekarî hatiye dinê û di sala 1707 de li Bazîdê anjiyan bûye.



Berî Ehmedê Xanî hozanên wek Elî Herîrî, Baba Tahirê Hemedanî, Melayê Cizîrî, Feqiyê Teyran bi zimanê Kurmancî berhemên hêja afrandibûn. Xanî ne kesê yekemîn e ku bi Kurdî helbest nivîsandine, lê ferqa wî ji wan helbestvanên berî xwe ew e, ku wî **doza azadiya gelê Kurd wek mijara sereke dabû ber xwe.**

Berhema wî ya sazêş "Memûzîn" wek sertaca toreya Kurmancî ya klasîk tê pejirandin. Ew ji bo gelê Kurd bûye çavkaniyeke netewî ye giranbiha. Xanî ji bo afrandina nasnama netewî, ji bo bilindkirina ala yekitî û azadiya Kurdan ev berhem nivîsandiye. Herçend ew dastan çîrokeke evînî be jî, lê hozanê mezin xwestiye bi riya wê çîrokê fikir û ramanên xwe, daxwaz û pêşniyazên xwe pêkêşî gelê xwe bike.

Ji bilî "Mem û Zînê", du berhemên wî yên din jî hene, "Nûbar" (Nûbahara Biçûkan) û "Eqîda îmanê". Wek tê zanîn Nûbar ferhengoka Kurmancî ya pêşîn e, ji bo zarokan nivîsandiye.

Va ye Xanî diqîre û kela dilê xwe dertîne..

Ez mame di hikmeta Xwedê da	Kurmanc di dewleta dinê da
Aya bi çi wechî mane mehrûm	Bilcumle ji bo çi bûne mehkûm
Kurmanc ne pir di bê kemal in	Ema yetîm û bê mecal in
Fîlcumle ne cahil û nezan in	Belkî sêfil û bê xudan in
Ger dê hebûya me jî xudanek	Âlî-keremek, letîfedanek

Di heqê Ehmedê Xanî û kitêba wî Memûzînê de, bi min be, mirov dikare bibêje, ku Xanî ne tenê xudan kitêb e; Herwaha Xanî pêxember e jî. Pêxemberê Ola me ya milî, pêxemberê ola me ya nijadî ye.

Xanî di demeke waha de rabû, ku beriya niho bi sêsed û neh salan, di heyameke welê de, bîra gelê xwe, bîra Kurdayetiya xwe biribû û ji Kurdan re gotibû; Hûn berî her tiştî Kurd in, rabin ser xwe, dewleteke Kurdî çêkin, bindestiya miletên din mekin.

Eslê Xanî ji êla hekariyan ji eşîra Xaniyan e. Ew hatiye li Beyazîdê rûniştiye. Xanî mizgeftek jî bi navê xwe li Bazîdê ava kiri û di kenarê wê de hat binaxkirin.

**Lewra ko dema ji xeyb fek bû
Îsal gehiştê çil û çaran**

**Tarîx hezar û şêst û yek bû
Ev pêşrewê gunahkaran**

Ji bilî Memûzîn û Nûbiharê, wî gelek nivîsên evînî, helbest û malik bi zimanê Kurmancî gotiye. Xanî ji bo Nûbiharê dibêje:

**Ji paş hemd û selewatan
Vêk êxistine Ehmedê Xanî
Ne ji bo sahibî rewacan**

**Ev çend kelîme ji lixetan
Nav lê Nûbihara biçûkan danî
Belkî ji bo piçûkê di Kurmancan**

Ji Eqîda îmanê:

**Sifatê di sebhe ji bo zilcelal
Xweşî, şîn, zanîn, vên û kelam**

**Bizan heft in ey arîfê pir kemal
Bihîstî digel dîfî bû tamam**

Ew di zimanê Erebî û Farisî û Tirkî de, jî pir jîr bû û xudan zanîneke bilind bû.

Xanî li Beyazîdê dibistanek jî avakir û tê de dersa zarokan bi Kurmancî digot. Di pey mirina wî re şagirtê wî Smaîn, bîst salên din dersên Kurmancî li wê dibistanê didan.



Ehmedê Xanî herwekî bi xwe gotiye, wî Mem û Zîn ji xwe re kirine behane û bi vê berhemê kula dilê xwe bi der daye, derdê miletê xwe yê kerûlal bi ziman kiriye û ew axivandiye.

Mem û Zîn ji bo Ehmedê Xanî remzên Kurdistanê, rêzikên welatê wî ne. Xanî dibîne, ku ew rêzik wînda dibin, Kurmanc bi zimanine din dixwînin û dinivîsînin, bi rêzikên miletên din ve diçin, belgên xwe yê nijadî ji ser xwe davêjin, dikevin rengên miletên din û bi vî awayî bindestiya wan dîkin. Seyda dibêje:

Sazî dilî kul bi zîr û bem bit
 Şerha xemê dil bikim fesane
 Nexmê we li perdeyê derînim
 Derman bikim ez ewan dewa kim
 Meşhûr bikim bi terz û islûb
 Ewreng bikim ji nû serefraz
 Dilber li Memî bikin girînê
 Ev meywe eger xirab e ger qenc
 Ev meywe eger ne avdar e
 Ev tîfl e eger ne nazenîn e
 Ev meywe eger ne pir lezîz e
 Mehbûb û libas û gûşîwar e
 Ez pîlewer im ne gewherî me
 Kurmanc im û kûhî û kenarî

Sazendeyê 'eşqî Zîn û Mem bit
 Zînê û Memî bikim behane
 Zînê û Memî ji nû vejînim
 Wan bê mededan ji nû ve rakim
 Mîmtaz bikim mihîb û mehbûb
 Da bêne temaşeyî nezerbaz
 Aşîq bikenin bi derdê Zînê
 Kêşaye digel wê me dused renc
 Kurmancî ye, ew qeder li kar e
 Nûbar e bi min qewî şîrîn e
 Ev tîfl e bi min qewî 'ezîz e
 Milkêd min in ne miste'ar e
 Xudreste me ez ne perwerî me
 Ev çend xeber in di Kurdwarî

Ehmedê Xanî berî 311 sal jiyaye, di wê demê de wî zanîbû ku
 Kurd lev nakin, hertim jev pijiqîne û ne li ser hev in, heryek dibêje ez
 û nekes. Ango: Nexwaşîya ezîtiya qirêj ketiye xwîna wan !???

Lewra weha diqîre:

Lew pêkve hemîşe bêtişaq in
 Ger dê hebûya me itifaqek
 Tekmîl dikir me dîn û dewlet
 Rom û Ereb û Ecemêd ferman
 Bextê me ji bo me ra bibêt yar
 Rabêt ji me jî cihan-penahek
 Ger dê hebûya me serfirazek
 Ger dê hebûya me padişahêk
 Ez mame di kitmeta xwedê da
 Aya bi ci wechî mane mehrûm
 Her mîrekî wan bi bezlê Hatem

Dayim bi temerud û şîqaq in
 Vêkra bikira me inqiyadek
 Tehsîl dikir me îlim û hîkmet
 Meşhûr e bi navê Mîrê Botan
 Carek bibêtin ji xew hişyar
 Peyda bibêtin me padişahêk
 Sahib keremek suxen-newazek
 laiq bibûya xwidî kelahek
 Kurmanc di dewleta dinê da
 Bîlcumle ji bo çî bûne mehkûm.
 Her mîrekî wan bi rezmê Rustem

Yanê her mîrekî Kurd bi gernasî, cîwanî, camêrî û comerdîya xwe
 weke Hatem e. Hatim mirovekî Ereb bû, alîkariya belengazan pir
 dikir. Her mîrxwazekî Kurdan jî di şer û cengan de, bi pehlewaniyê û
 qehremaniya xwe mîna Rustem in.

Lê gelekî mixabin! Di dema ku Xanî êşa bîndestîya gel dikêşand,
 gel guh nedida axaftin û gotinên wî. Tenê weke hozanvanekî, yan jî
 dengbêjekî lê dinêrîn û ew dinêrxandin. Nedizanîn ku Xanî ji azadiyê
 re, jî rojê serfiraz re dibêje. Rizgarkirina Kurdistanê ji Xanî re derd
 û kuleke giran bû. Di dilê wî de Kurdistan weke guleke geş bû, her

demê li ser dinalî û keserên kûr dikîşandin.

Di demeke wisa de ku bi hemû renga welat dihat dagîrkin, bilindkirina navê Kurd û Kurdistanê ji aliye Xanî ve, karakî gelekî mezin bû. Gava ku em qala Kurdperweriye Xanî dikin, bi taybetî em wê niştimanperweriyê bi wê demê ve girêdidin û dinexînin. Ehmedê Xanî di Mem û Zînê de, dîlî û bindestiya gelê Kurd weke wêneyekê rûnî kiriye. Xanî dixwest bêje, çî gava ku Sefewî û Osmanîyan pev re şer û cengê dikirin, Kurd di nava şerên wan de dihatin kuştin

**Ev Qelzimî Roma û behrî Tacîk
Kurmanc dibin bi xûn muletex
Camêrî û himet û sexawet
Hîndî ji şeca'etê xeyûr in
minetê nefûr in.**

**Hîndî ku dikin xiruc û tehrîk
Wan ji êk ve dikin mislalê berzex
Ew xitma ji bo qebîlê Ekrad
Ew cend ji**

**§ Werin em pevte têkevin hundurê destana XANIYÊ NEMIR
(MEM Û ZÎN)**

Xaniyê nemir û zana, wek hemo gelên ku ketibûn bin hikariya çanda ola îslamî, ta helbestek an namak binivîsanda, gerekbû bi navê Xwedê an bi pesna wî dest pê bikira. Jixwe, Xwedê ne yê muslimanan bi tenê ye, ew ê hemo olan e, ew di van malkên jêrîn de, yekbûna Xwedê dide xuyakirin:

**Ey şukrê te cewhera zebanî
Ey wahidê bêserîkê yekta
Ey baqiyê bêzewalê dayim
Ey xaliqê erd û esimanan
melek û felek bi carek
tebarek**

**Subhanek kule ma feleqit
Bê husnê te nîne wan wucûdek
Sorgul te kir ji xar peyda
Ronahî te da ser şemalan
Totî bi xwe ma şekir dirêjin**

Zebanî: ziman.
Cenanî: Dil.
Yekta#Hemta.
Şema: Şeme.

Sîqla: Ewê ku zingarê ji ser şûran paqij dike.
yekta: Tenê, jê tune.
Numûdek: Mexloqat/jînber.
Totî: Bexbexa. Hemta: Jê heye.

**Wey zikrê te sîqla cenanî
wey wacidê bênezîr û hemta
wey hadiyê bêfenayê qaîm
wey xaliqê cumle ins û cinan Mulk,
Bil-cumle te çêkirin**

**Ehsente fekeyfe ma xelet
Bê nûrê te nîne wan numûdek
Bilbil te kirin hezar şeyda
Perwan kirin bi şewqî talan
Herçî dibhîsin wê dibêjin**

Hevpeyvîn digel Dr. Mihemed Elî

Pertewê Şerqî

Dr. Mihemed Elî ji bilî karê bijîşkiyê, rewşenbîr e, nivîskarê zimanê Kurdî û Eerbî û mamosteyê ziman û rêzimanê Kurdî ye.

Ji demeke dûr de gotarên wî bi herdu zimanan di kovar û rojnaman de tên weşandin.

Li van çend salên dawî berhemên wî bi zimanên Kurdî û Erebî belav bûne. Pirtûka wî ya rêzimanê Kurdî, ji aliyê gurûpên fêkirina zimanê Kurdî ve tê bikaranîn. Lê ya bi navê “Çiyayê Kurmênc” ku bi zimanê Erebî li ser dîroka devera Efrînê hatî nivîsandin gelek balkêş û dewlemend e. Ji ber tunebûna jêderan û çavsoyîya rêcîmê wî gelek asteng, êş û derd ji hemû hêlan ve dîtin.

Lê mixabin, tukesî bi ferehî û ji nêzîk ve Dr. M.Elî nedaye naskirin, û ew wek leşkerekî wenda ma ye, bila ew li me bibore, em bi derengî li wî bûn mêvan û me ev hevpeyvîn pêre kir.



P1: Tu dixwazî hîn bêtir xwe bidî nasîn?

Tiştê giring yê ku te ne got, ew e ku min zarotî û ciwantiya xwe li gund derbaskirye, yanê di kesayetiya min de sirûştê welêt diherike, bi reng û rûdawên wê hatime stiran, li ba

min hemî endamên sirûştê bi Kurmancî daxivin, bi Kuramncî dijîn û bi Kurmancî jî hez dikin. Ji lewre jî ez xwe bextewar dibînim.

P2: Wek em dizanin ti dibistanên zimanê Kurdî li Sûriyê tunene, yanê qedexe ye, tu çawa fêrî xwandin û nivîsandina zimanê Kurdî bûyî û kînga?

- Bi rastî, tunebûna dibistanan û qedexekirina çap û weşanên bi zimanê Kurdî, ji mirovê

Kurd re pirseke giran e. Zarokên me bi Kurmancî deng dikin lê bi Erebî dixwînin û

dinivîsin, ew jî di warê perwerdekirin û şîndankirina kesayetiya wan de pirsgirêkeke mirovanî ye mezin e. bi sebareta min, netê bîra min kengî û çawa ferî xwendina bi zimanê Kurdî bûme. Tu kesî ez fêr kirim, ez bi xwe fêr bûm. Lê

P3:Wek em dizanin rêzimana Kurdî ne ewqas hesan e, gelo tu ji xweserê fêrî rêzimên bûyî, yan bi alîkariya mamostan?

- Ya rast, ez bi saya mamoste Dr.Mecît Şêxo nêzîk rêzimana Kurdî bûm û min jêderên rêzimên nas kirin, paşê ez bi xwe pêde çûm. Ew rojine gelek xweş bûn, nêzîka panzde salan di ser re derbas bûne. Mamoste Mecît girûpeke fêrkirina

P4:Pirtûkeke te bi nave ‘‘Rêzimana Kurdî’’ hatiye weşandin, te bi xwe tukes fêrî zimanê Kurdî kiriye, tu dikarî hejmara wan diyar bikî û kengî?

- Belê min çend korsên zimanê Kurdî vekirin û gelek dostên xwe hînî rêzimên kirin. Ew stubariya her mirovekî Kurd e, gerek e em ji rewşên

P5:Têkliyên te bi kovar, rojname yan bi dezgehên zimanê Kurdî li hundir û derveyê welêt re çi ne?

- Ez ji sala 1984 an de bi Erebî di belavokan de divivîsim, û ji sala 1996 an de di bi Kurdî jî dinivîsim, nemaze di belavoka ‘‘Newroz’’ de. Ez niha di kovara ‘‘Pirs’’ re jî berheman dişînim. Lê tu têkliyên min yên yekser bi dezgehên zimên yên ku li

ya baş tê bîra min ew e, min di havîna sala 1971 an de, gava panzde salî bûm, min destana Mem û Zînê xitim kir. Lê berî wê alfabeya Osman Sebrî di nav destan de digerî, yek di riya ‘‘Partî’’ re bi dest min jî ket û min tîpên Kurdî ji wê nas kirin.

rêzimên li Helebê çê kiribû, ez jî vexwendimê, ez li Efrînê rûdiniştim û her car diçûm Helebê, wê korsê nêzîkî salekê berxwe da. Ereb dibêjin ‘‘kî min hînî tîpekê bike ez jê re kole me’’, ez jî wê gotinê diyarî mamostê xwe Dr. Mecît dikim.

dora xwe xortir bin, gava zimanê me qedexê dibe, em destgirêday nasekinin, emê bi her awayî dara zimanê xwe avdin, wê şîn û gulvedayî bikin.

derveyê welêt re tunene. Di ware nivîsandina bi Erebî de, mamosteyê min rêzdar Şêx Alî ye.

Sala 2005 an, ji bo beşdarbûna di konfirasê zimên ê ku li Amedê hat girêdan ez hatim vexwandim, lê

mixabin, ji ber hin sedemên taybet ez beşdar nebûm.

P6: Di paşerojê de, projeyên te di amadekirina tu pirtûkan de hene û eger hebin ew di çi warî de ne?

Belê, min du pirtûkên bi zimanê Erebî amade kirine, yek li ser xaknîgariya navça “Çiyayê Kurmênc” e, û ya din li ser Êzdiyên Çiyayê Kurmênc

e. Û min dil heye, pirtûkên ku min li ser navça Çiyayê Kurmênc bi Erebî nivîsandine teqle zimanê Kurdî bikim.

P7: Pileyên kovar û rojnameyên Kurdî û nivîskarên wan li Sûriyê tu çawa dibînî û dinirxînî?

Gereke mera wan di rewşa demkî ya rast de binirxîne. Yan jî mera dê xwe şaş bike û wan bêşîne. Rewşa zimanê Kurdî li Sûriyê diyar e, wê rewşê hemî derî li pêş pêşveçûna zimanê Kurdî girtine. Ev yeka han

nahêle, ne kovar û rojname di heyameke normal de rabin, ne nivîskar derfeta xwe bibin û ne jî xwendevan peyda bibin. Di van rewşan de gereke em bêjin: Biravo û spas ji her yekê ku li zimanê xwe xudî derdikeve.

P8: Ji bo pêşketina zimanê Kurdî li Sûriyê ji dezgeh û nivîskarên Kurd re çi pêşniyar dikî?

Dem dema dezgeh û rêxistinê ye, rêxistina her tiştekî, ji jiyana mirov de bigre û hilkişe. Ji nivîskarên zimanê Kurdî re jî rêxistin û pevgirêdanek pir pêwîst e. Pir girîng e navendeke me ya zimanî hebe, da ku ji hemî nivîskaran re bibe mîna motika lêvegrê.

Yek ji stûbariyên wê navendê nêrevaniya derçûna berhemên nivîskaran bike. Ji ber ku mixabin, pir caran, tiştin çap dibin, gelek şaşiyên vekît û rêzimên tê de derbas dibin, ji naverokên wan yên qelse, ew jî tiştekî ne baş e, gerek derbas nebe.

P9: Ji bo yekbûna zarawên Kurdî li seranserê Kurdistanê nêrînên te çi ne?

Ez bawer dikim mebesta te yekbûna zarawan di warê nivîsandinê de ye. Yanê pêkanîna zimanê nivîsandinê yê stenderd e. Ev pirseke giran û pir şaxî ye, dem, merc

û rewş lêhatî jê re gerek in. Lê bi baweriya min be, kevirê bingehîn ji çareserkirina wê pirsê re yekkirina tîpa ye. Eger karek di wî warî de bibe dê ji wê de dest pê bibe.

ZIMANÊ DILÊ MIN

Muruvet. Y. Cacim

«Ev çend car e, ew tirên tê vê stasyonê. Ev çend car e destê min dû wê de vala dimîne. Ev cara çenda ye bi per û baskên şkestî paşva dizivirim tenêbûna xwe. Ev cara çenda ye ez û tenêbûna xwe bi serhev de şînê dikan. Ev kambaxên me wisa vik û vala ne û wilo tenha bûne, lewra tu ne li vir î. Tirêna ku tu hilda birî jî êdî nayê vê wêranê.»

Ez dizanim, tirêna ku tu hildayî birî hew tê vê stasyonê, ez dîsa jî bendewar im li wê stasyonê. Ev nameya çenda ye ez ji te re dinivîsim! Êdî ez jî nizanim, lê xwezî te bizanibûya.

Her tişt di payîzekê û rojêke bi baran de dest pê kir û dîsa di payîzekê de wek roja reş qediya.

Tu payîza sala 1979an bigire û li payîza 2001an bixe! Gelo wêneyeke çawa dertê meydanê.

Her pirseke te wek rexneyên tûj, tev nêrînên te wek tewanbarî, her gotinên te wek xencerê û durûtiya rûyê teyê ku tim gotin û kirinên min dipêve di wê wêneyê da ne. Devê te ji pêşerojê re mizgîniyê dide, lê di rûyê teyê xweşik da û kenê teyê xwapînok da sextekarî dibare.

Ez nizanim ji ber çî ye, ku roman,

kûrteçîrok û helbest bi piranî di rojên payîzê û di rojên bi baran de dest pê dikan.

Rojên payîzê, nexwasima

rojên bi baran, bi min romantîk jî nînin û ne xwaş in jî. Ez van rojan

nahebînim, tu jî dizanî! Lê dîsa jî te ez avêtim bahoz û girdava van rojan. Min çî xeyal û hêvî dikirin?. Lê pelên dara min a hevîdariyê pir zû weşiyar; û bi ser pelan da hêşirên çevan hene. Hên kû nehatibû payîz...lewra jî hên nefirîbûn evînen koçber û ez hên hîne tinebûna te nebûbûm. Min dilê xwe, yê ku bûye bendergeha kul û derdan nexapandibû. Ez di gergefa janan da bûm nexsa derd û êşan, totê cemedeke tariya tenêbûnê bûm.

Hingî tu çûyî şevên min girtî ne û rojên min kelepçekirî ne. Tinebûna te jana zirav e, derdê bê derman e. Bê zagon û bê îfade kuştina dilan e. Tinebûna te hewar e. Hewareke ji xemgîniyan, derd, kul û ji araman dapaliye maxzana (girtîxana) dilê min.

Roj wergeriya û cih da şevê. Min dîsa sibeh kir. Rojêke nû li



ser dilê minê tarûmar(talan) hildibe. Bawer bike ji min, tu hebûyî li bal min, yek jî cîxara min. Dost û hogirekî baş nîne, tû jî dizanî! Ev mîrata cîxarê...lê dîsa jî dikişînim. Ji ber tenêbûn û bêkesiyê. Ne dayîk û bavên min li bal min in, ax...ne jî ez li Nîştiman im. Wisa tenha me ez... Mîna rêka bê rêwî, mîna çiyakî bê berf û wek çivîka bê bask. Min dixwast, ku cangorî û bawêşîna welatê xwe, çikên baranê, tûrêjên rojê û keskesora heftrengî ji te re par bikim. Ez jî dizanim, tu pir dûrî min î û ti derfetên min jî nîne, ku te bibînim. Çevên min dîsa tijî dibin. Mêze bike! Roj zelal bû, bi qasî kela dilê min bilind bû. Ev dilê ku bûye têra derd û kulan azad dikim, va diçe dilê minê penahber (mûltecî) û birîndar. Min dilê xwe firand, li çol û çiyayên welatê xwe. Hisên min siwarên li ser baskên bayê, tûrêjên rojê di çavên min de xemgîniyê dixwînin. Bayê sibehî di guhên min de û hêdîka dîbêje, xeman nexwe! Rojên jiyana xweş tîn, rojên ku tijî hêvî û bawerî û hêviya min dîsa jî ma rojeke serbixwe û çevên min êdî bi gotina min nakin... Rojên bêyî te, ez ji rojên bê şer û kurtahiya jiyane dihesibînim. Ax dikim, digirîm li welatê biyaniyan û xeyalan mezin dikim; di dilê xwe yê mayînkirî de. Xeyalên min reng bi reng in û êdî bûne bingeha ramana min. Di xeyalên min de yek dayîka min, tu

û welatê min, nexwasima jî welat...

Te dilê xwe kîneke neheq, rikeke badîlhewa tijîkiriye û ji bo çî ye ev kîn û rik? Te dilê xwe jêkiriye, daye destê xwe û diçî, cangorî di kû da ev çûyîn?

Were rûne xwarê!. Belkî tiştên ku bîrvakirî yên ku em hîç nepeyvîne hene. Bi eslî (Esasî) ji bo çî derket ev şera? Ez jî nizanim, lê tenê tu nînî, yê ku tewanbar e, ez jî dizanim, lê encam li ber çevan e. De were rûne xwarê, te stûmala(gerdanparêz) xwe jî nebiriye. Dibe jî min nedaye te. Ji min we ye tirê, te hemû tiştên xwe biribûn, lê bîrewariyên min hene, ez wan bîranînan nadim....ez pepûk bibim jî nadim....

Kî dîzane, belkî jî ez û tu rojekê...? Belkî jî li cihekî nizanim...ax nizanim... Hêdîka! Weke dizekî ji mal derneyê û nebeze. Li dû xwe bizivire, li min binihêre, li çevên min mêze bike. Dibe jî ez bigirîm, lê tu çima digirî û çevên te bi hêsir in? Negirî; were em bipeyivin, belkî jî em bi hev re jiyana xwe bidomînin, tu bi xiyaneta xwe ve, ez jî bi tenêbûna xwe re... Tuyê bibûya bengîniya ciwantiya min û hisên minê bi kovan(hisret) ku di dilê min de nû aj didan, ne ku zemherîriya mirinê, dengê tenêbûnê û bayê xiyanetê... Were rûnê, neçe em bipeyivin, derve sar e, cemed e, bager û

bahoz heyê û dilê min di bin berfê de ye...

Bi mêranî destê xwe bide ser gewherê di bin sîngê xwe de. Tu evînê nasdikî, lê evîndariyeke bê gerew? Tu çiqas hatî hezkirin? Hezkirineke ku ji kerban însanan dibe ber mirinê.? Te porê biharê carekê mizda û hembêz kir? Bihareke ku dû zivistana dijwar hatî.? Te dilê xwe firand şînokiya esman û li ser baskên kevokên azadiyê? Carekê, hema yek carê, tu leyîstî bi bîrîqînokê ser ava deryayê de û carekê stêrkên esman berjêrî dilê te bûn.? Te şerbeta jan û derdan wek şerbeta evîndariyê vexwar...gulm bi gulm.? Te di rojê nû de, bi avêtina şefeqê re, deriyê dilê xwe vekir.? Te carekê di deriya tenêbûnê de avjenî kir.? Tenêbûna bê dawî û wek êşa kulê.? Dem siwarê baskê baz e, tu pê hisiyayî, ku dem çawa di ser me re tê û derbas dibe ...wek çerxa felekê. Tiştên ku ji me dibe jî paşva nade ticarî. Belkî jî dem sekiniye em têde derbas dibin diçin. Te carekê, qet carekê bêhêviya hêvîdariyê kuşt? Gelo te di mirineke malxirab da jiyaneke nû afirand? Hinek jiyaneke ku di hawarên kûr de bûne wek bîranînan, gava ew jiyaneke hildiweşin, wê demê, tam jî di wê demê de te dilê xwe wek mermîkî (Gulle) avête ser sîlahê.

Lê min; dilê xwe yê penaber di lûleya(namliya) aştiyê de teqand. Roj qulibî, şeva tarî dest pê kir. Di dilê min de êşeke zirav, di çevên min de hêsirên rêbez û bi ser lêvên min de strana bêwelatiyê û penaberiyeke, esman jî teve şîna min dibe...

Ez hêç hez nakim... ji şevên koçberiyê. Şevê ez qetandibûm ji diyarê Mem û Zînê û ez avêtim derya hesretan. Di dilê min de senfoniya hesretê bi xemgînî dilorîne. Dilê minê penaber di şefeqa sibehê de difire û li ber pencerekê disekine, ji wî weye tirê ku dikare bifire welatê xwe. Li derve cemed e, qeşayê xwe avêtiye pencereyan ...berf bi dilê xwe dibare. Berfa her welatî bi xwe xwaş e, lê berfa welatê min ji berfa hemû welatan xweştir e û germoktir e, wek însanên welatê min. Dilê xwe li ber pencerê hildidim û difikirim. Bi ser mirinê de diçim û gefan dixwim, lê dilê min bê giyan dikeve, li xerîbiyê mirin zor e, mirineke penaber hên jî zordar e. Ji ber ku ez di jiyaneke de jî, di dilan de jî koçber im û jiyana min di her deman de bi xemgînî, kul, derd û bi aram bû. Jiyana min straneke neqediyayî ye...

Ez jî dizanim jiyaneke xwaş e, lê ji bo min jiyaneke xeyalek e. Êdî min bendê jiyaneke ji destê xwe revand. Jiyana min wek gemiya xemgîniyê bi dilkovanî ji bendergeha dilê min de qetiya û çû. Heywax! Girîn û

zarîn kar nake. Min evîn û baweriyên xwe bi bengîtî avête ser pelên daran ku bawêşîn ber bi te de bîne... Êdî kortikên çavên min jî zûha bûn. Piştî şeveke bê xew, di şefeqeke xemgîn da, me dîsa şeveke bê te, lê dîsa jî tu di wê şevê de hebûyî...şeveke westiyayî û şeveke bêdeng...

Malxirabên şevan çiqas bê deng in, wek bîrên tarî û kûr, kerr û lal in wek mirina bê dawî. Şevên ku hisretê dawî nake, pevgîhanê (gîhîştîna hev) xwedî nake, dipalîn kûraniya bîra dilê minê birîndar. Tikes hewara dilê min nabhîse; ramana min dixwaze ku roj derê û bibe sibeh. Lê dilê min naxwaze ku bibe sibeh, dema ku tîrêjên rojê gerdûnê hembêz dikin, tenêbûna min hên jî mezin dibe û zêdetir xwe kifşe dike. Dibe êşek û wek marê kor li bedena min digere. Wek arê dojhê di dilê min de bilind dibe. Ez wisa stûxar û xemgîn dibim, hêsirên min bi xwe tîr xwarê, lê ez naxwazim bigirîm, ku tu hêsirên min nebînî û ez te ji nava dilê xwe derxim, veqetînim û bavêjim. Ne te dixwazim ne jî evîna te. Dilê min ji min re pir bextreşiyê dike, lewra gava bû sibeh, hisên dîlê min ji mentîqa (aqil-Raman) min serdesttir bûn.

Lê dilê te ji simbilên li ber bayê asêtir e, ji bedena te re îsyar(raperîn) dike. Dilê xwe azad berde, bira têde roj vede, di çavên

tede şefeq bavêje. Çavên te wek şûrekî qeşagirtî ye, hêdî hêdî bi dilê xwe re berjêrî paşila min dibe...diricifim, lê dîsa jî bi kela dilê xwe de çevên te bi dilekî bengî germ dikim.

Xeman nexwe ti car, ez germaya evîne herdem di dilê xwe de xwedî dikim. Ji ber ku evîna min bêhempa û pir mezin e, evîna min di jiyana te de keskesoreke heftreng bû, evîna min di çavên te de pêlpêlî ye. Di esmanê şînok da li ser baskên kevokan de bawêşîn e. Evîndariya min di çiya û baniyan de gul û beybûn e, û evîna min bendergaha tenêbûna min e... Bi te re hîne kenê şêrîn bûbûm û bi te re min evîn û evîndarî naskir. Bi te re hîni hizkirina dinyayê bûm, û bi te re min evîna dilê xwe mezin kir. Dîsa jî te bi min stemkarî, xedarî û evîneke dijwar û jîyana bê giyan da nasandin... Bi naskirina te re ez ji şevan xeyîdîm. Lê dîsa kenê te yê xweşik di şevan de diniquete dinya min; ew kena hêdîka, bi qayîde û nermikî, wek êşeke xedar, bedena min dipelîne. Demeke dijwar e ew dem, demeke ku can tabnake, ku di wê demê de tu tine yî, deng tine, ronahî tine, hevîdarî tine. Tarîke reş, şevereşeke fetisokî li dora min e...

Tinebûna te bêqudûmî ye, bêçaretî ye; tinebûna te qehr e, kesirandin e... Tebata tinebûna te kevirê sebrê ye û gula hesretê ye.

Hesreta min jî penaber e. Hinek caran di hesretên penaber de jî hevîdarî aj dide, lê ji bo bîrkirina carekê hezar gotin bê kifayet dimîne. Lewra paşeroj jî pêşeroj jî êdî şîfreke genetîk e li bedena min...

Gelo ev nameyeke pir dirêj e ez ji te re dinivîsim, an ji şîngirtina jiyaneke ye? Jiyanekê ku wek kaxizeke qelişî, wek dîwarekî ferîşî, wek guleke çilmisî, wek bêhneke fetisî...nizanim, lê dîsa jî ji te re dinivîsim û dihesibînîm ku tu heyî. Ez bi te difikirim, ji min weye tirê tu min tînî bîra xwe. Tava sibehê gava xwe davêje ser axê, bêhna wê axê çawa tê wek jiyaneke nû?. Ez dixwazim şefeqê bi tîrêjên rojê re bayekî nermik hisên dilê min bîne ji te re. Dizanim tu li benda hisên min nemayî ticaran, lê ez dîsa jî li benda roj û bayê me mîna ku çawa li benda te mam. Di demên şefeqan de jî û tariya şereş de jî ez li benda te bûm. Zemheriyê di cemedê da û di qeşagirtina her deman de jî benda te mam. Demên rojhilatê ku roj diqulibî cih dida şevê, di wan deman de ez hên bêtir li benda te dimam.

Gerek te bizanibûya ku dilekî sêwî û westiyayî bi kesera te li derekê ji bo te lêdixe. Her rojên ku bi ser min de diqulibin pirtir min heznî dikin. Êdî ti tişt biryara jiyane nadin min; ne bayên sibehê û ne jî tîrêjên rojê. Ti tişt tamê

nade min. Di esmanê şîn de firînen bazan, wîtniya çivîkan, herikandina avan, bişkivîna gulê û qebe qeba kewê, ti tişt ji min re êdî tam nade. Tam nade jiyana min rojên bêyî te. Gava ku tu werî, kî dizane, belkî jî baxçeyên min çilmisî ne. Di gulistana min de gul nabîşkivin û rojên min jî edî bûne şev. Perdeyên pencerên min girtî ne, deriyê min kilitkirî ye û kî dizane, dema ku tu werî belkî edî ez jî tine me...

Her dem ez li te digeriyam, siya te têra min dikir. Niha pêjna te jî nayê. Rûyê min ken ji bîr ve kiriye. Êdî şereş min diparêzin û hevalên min in. Hîngî tu çûyî, cihên tenha û tarî bûne hogirên derd û kûlên min. Ez dîsa şer dikim, lê bi te re na! Vê carê şerê min bi wêneyê te re ye; dihesibînîm ku tu yî li wêderê. Di dema hebûna te de dilê min çawa gurpegurp dikir. Dema tu çûyî qudûmê min nema, ku ez bêjim neçe. Niha di zîndana dilê sêwî de û perestgeha bîranînan de li ber wêneyê te dibêjim neçe, NEÇE!. Hîngî tu çûyî, ew gurrîniya arê dilê minê sêwî bêmecal ma û temirî. Ez 2 yê Adarê 1980î hildidim li 31ê Kanûnê 2001an dixim, digirim bi devkeniyeke (beşûş), heznî û mehsûn bi kula dilê xwe re didim rexê lêvên xweyên ku ken ji bîr ve kirine. Ji bo ku bibe wek wêneya derd û êşên dîrokî. Ji bo ku ez ticar

kirinên te ji bîr ve nekim...

Ku tu rojekê ji nişkê ve derkevî – werî; derya axîn û keseran di dilê minê xemgînde de pêlpêlî bikî jî, êdî tu min nabînî û nasnakî. Ez ne ew ez im. Êdî ez tine me. Tu qatîlê roj û şeva yî, tu qatîlê his û evînê yî û qatîlê dilê ew Eza berê yî. Te ew Eza berê ji zû de mirand. Ew Eza berê di gergefa janan de bû nexşê arama dilan û totê geliyê seqemê bû, û niha jî cemedê tenêbûnê germ dike. Li çavên min nenihêre, di bîbikên çavên min de li xwe negere, çalakiyên te wê vala derên. Ji ber ku tu ji bona min tine yî... Di çavên min û ramana min û her wisa di dilê min de jî tu cih nagirî. Di orta dilê min de mezelek heye û di wê tirbê de jî çî heye tu fêmkirî; ji boyî fêmkirinê his lazim e, ew jî karê te nîne... Hisên dilê min nepîve. Hisên dilê min aliqîne-asê bûne. Ew hisên ku derba mirina malxirab hildane. Ew hisên ku di şevên bê tavehîv de derba xiyaretê xwarin. Min got, nepîve hisên min û min kelogirî neke. Ev dem ne ew dem e êdî. Avên çeman hemû nagihêjin deryayê. Çawa ku min bîrvakir ken û henek, wisa jî min bîrva kiriye girîna ji bo te. Di çavên min de hêsir hebe jî

zinhar! Tu nebe ser xwe. Ew hêsirana şingirtina mirina hisan e. Şingirtina evîna koçber e. Xatirxwastina gemiya jiyane ye, ku ji bendergeha vir û derewan diqete û ber bi jiyaneke nû de diçe. Tu jî here, nesekine li van deran. Bila di dilê min de janeke zirav bimîne. Payîz hat dîsa. Dema pelweşîna daran e. Perdên pencereyên min venekin, li zengilên deriyê min jî nexin. Tenêbûnê bêtir kes bi ser min de nehat bi salan; ji ber vê yekê min jî zengilê deriyê xwe hilweşand û avêt. Mîna ku çawa tu jî hatî avêtin ji dil. Va ye dîsa payîz hat, ez dilê xwe davêjim ser baskên kevokan û dişînim welatêxwe. Ji ber ku dilê min hisên xwe biparêze, mîna darên payîzê pelweşiyayî nebe. Welat dilê min dihebîne, her wisa dilê min jî wî. De here êdî dem hat, vê carê mîna dizekî jî nereve, deriyê min kilît bike, piştî xwe bide min û wisa here. Ez li benda biharê me êdî. Di biharekê de dixwazim bikenim êdî... Bê hêvî jî nînim, lê yê ku ez li bendê me êdî ew jî tu nînî...



Ciwanî û kalî

ÎVAN BÛNÎN

Wergerandin ji Rûsî: Rezoyê Osê

Rojin havînê yên bedew,
derya Reş a hêmin.
Gemî ji mirov û
qirûqafan mişt e, ban ji mûnet
tanî bi dizîkan barkirî ye.

Rêwîfî dûdirêj û xîzikî ye –
Kirim; Kavkaz; kenarên
Anadolê; Konstantînopol...

Rojeke tîrêjtûj, azmanekî
şîn, deryake xemrî, rawestanên
bêdawî li derbendên ji
ademîzadan mişt û qîjqîja
Qumriyan, ko guh li mirov
ker dikin, sixêf, qîrên
berdestîkên gemîvan: Mayîna!
Vîra! û ji nû ve hedinandin,
guhdarî û riyê ne lezok di
ber çiyayên dûr ve, yên di nav
leylana rojika agirbarî de
winda.

Rêwiyên serpişk li ser cihên
hînik, vala, paqij û fereh
hêwirî bûn. Lê, rêwiyên
belengaz û bêqewdir li cihên
gemarî, di nav şelît û dîzikan
de, hêwirî bûn. Bihna dijwar ji
her cihî difûre. Gih germ û
xweş e, gih jî germixî û

dilxelênek e. Lê, her dimîne
cihê bêhtengiyê.

Taybetiya vê bêhnê,
taybetiyeke gemiyane ye, ko
tevî hêwîbûn û hînkayiya
deryayê dibe. Li vir mêr û
jinên Rûs in; nêr û mêyên
Ukrayînî ne; koçekên Afonî
ne; Kurd in; Gurc in... Kurd, -
miletê kovî ye -, ji sibehê
tanî êvarê radizên. Gurc jî,
yan distirên , yan cotik
direzisin, sivik diqevizin,
çengan sivik radixin, lepên
xwe vedikin û di nav rêwiyên
de mêlevaniyê dikin, bi
şêweyekî helperikane
diherikin: Taş– taş; taş– taş!.
Muqsiyên Rûsan, yên berê
wan li Palastîne, tim çayê
vedixwin. Mirovekî dirêj î
çengdaleqayî, xwediyê riheke
ziravik û poreke mûseyî,
nivîsekê bi dengbilindî
dixwîne, lê jinikeke bi fanêrekî
sor û desmaleke kesk î gazane
bi ser poreke reş î ziwa de
berdayî, ko di rex xwaringehê

de cîwar bûye û serbixwe diyar e, awirên tûj ji çavên xwe ji ser wî venade.

Em, demeke dirêj, li ber kenarê derbendekê rawestiyan. Ez peyabûme ser kenarê, û gava zîvirîm, min dît, çawa karwanekî nû ji Kurdên cilherhilî û çekdar bi pêpelûkan ve hildikişe – peyayên ko li pêşiya wî kalê mezin û hestûgir hildikişiyên, bi xavikên sipî û qutikên xercûlî bûn, bi qolanên bi zîv kutayî, li ser noqên zirav girêdayî, bûn. Kurdên bi me re, di rêwîtiyê de, bi komik, weke keriyekî li ser piştê gemiyê cîwar bûyî, tev rabûne ser xwe û yekser gêreke vala vemaliştin. Peyayên Kalo, ew cih bi mafûran raxistin û balgih danîn. Kalo, rengpaşane xwe li ser derzika piştê, li ser mafûran, vemidand. Riha wî weke pembo sipî bû, dîmê wî, ji tava rojê hişkole û qemirî bû. Ê çavên wî, yên mêşinî û hûrik, bi renekî ne normal diçîrisiyan.

Ez ber bi wî de çûm, li ser ferdekî Petatan rûniştim, silav lê kir û bi Rûsî pirsî:

- Ji Kavkazê yî?

Wî jî bi zarşêrînî, bi Rûsî bersiv da:

- Dûrtir ezbenî. Ez Kurd im.

- Bi kû de rêwî dibî ?

Wî bi mildarî, lê serbilindî, bersiv da:

- Ber bi Stambolê de, ezbenî. Cem Padîşah bi xwe. Ji Padîşah bi xwe re sipasdariyan dibim, diyariyan: Heft qamçiyên. Padîşah heft xortên min birin şer. Têv, tiştê hebû. Ê tev di şer de hatin kuştin. Heft caran Padîşah serxweşiya min kir.

- Tis; tis; tis! –Wî xortê raserî me rawestiyayî, bê dilêşaneke berbiçav, deng derxist. Xort xweşik û dagirtî bû, tosin bû û çixare di dest de bû. Ji Grêkên Kêrçî bû:

Kumekî Şamî yî gêlasî /rengqeresî -wergêr/, qutikekî xercûlî bi êlekekî sipî re, şerwalekî cûm î li gor modê û soleke gulyaxkirî bi pişkoken ji kêlekê ve girtî –Kalekî wisa û bi tenha xwe ma ye!– wî bi serhejandin got.

Kalo, li kumê wî nerî.

- Çi hovik î, - bi asanî bersiv da – va tê kal bibî, lê ez ne kal im û nema kal dibim. Çîroka Meymûn dizanî?

Xweşkoko, bê behwerî

bişirî :

- Çi Meymûn?.

- De baş e, bibihêze!. Dizanî ko xwedê erd û azman afirandin? .

- Belê, dizanim.

- Pişt re, xwedê mirov afirand û ji mirov re got: Tê, mirovo, sih salî li ser rûkê zemînê bijî –Tê jiyaneke xweş bibûrînî, tê kêf bikî, tê behwer bî ko her tiştê li ser rûkê zemînê xwedê ji bo te tenha afirandiye û saz kiriye. Tu bi vê danê kêfxweş î ?. Lê, mirov hizirî: Jiyaneke wisa xweş, lê tenha sih sal jiyân! Oy, xwedo, hindik e! – Dibihîzî? –devbiken kalo pirsî.

- Dibihîzim, - xweşkoko bersiv da.

- Paşê , xwedê Ker afirand û ji Ker re got: Tê rahêjî baran û kunan, wê mirov li te siwar bibin û bi rotikan li serê te bidin. Tu bi demjiyaneke wisa kêfxweş î ?. Lê, Ker zirî, girî û ji xwedê re got: Ez û hevqas ‘emir?. Xwedêyo, tenha pazdeh sal ‘emir bi min bide.

-Van pazdeh salan bavêje ser ‘emrê min – mirov ji xwedê re got,

- ji kerema xwe, ji para wî bi min bide ! Xwedê qîma xwe

anî û wilo kir. Wilo, ‘emrê mirov bû çel û pênc sal. Bi rastî ji mirov re xweş ket? Kalo, bi lênerîna xweşkoko, pirsî.

- Ne xirab derket ,- wî ne bi piştrastî bersiv da, bê ko zanibe, bê ko jê re diyar be, ev çîrok tev ji bo çî ye.

- Paşê, xwedê Seg afirand û sih sal ‘emir da wî jî. Tê, xwedê ji Seg re got, nobedariya malê xwediyê xwe bikî, behweriyê bi kesekî xerîb neyînî, tê bi rêwîyan de bireyî, ji netebatiya nava xwe bi şevan xew nekî. Erê, dizanî, Seg yekser zûrî: Oy, nîvê vî ‘emrî ji min re xîş bike, Xwedo!. Lê mirov dîsa ji xwedê xwest: Vî nîv ‘emrî jî bi min bide!. Xwedê, ew jî kire ser ‘emrê mirov. - Niha, ‘emrê mirov çiqas çê bû?.

- Bû şêst, - Xweşkoko bi gîrnijîn got.

- Belê, xwedê, pişt re Meymûn afirand, sih sal ‘emir da wî jî û got, ko dê bê zehmetkêşî û xemhilgirî bijî, lê dê dêmeke ne sipehî li ser be – Tu dizanî, tazî ye, bi qermîçonk e, birûyên rût di eniyê de çandî ne –û dê tim hewil bide, ko lê bête

temaşakirin, da herkes ji xwe re pê bikene.

Xweşkoko pirsî:

- Dêmek wî jî ev 'emir nepejirand, û nîvê vî 'emrî ji xwe re xwest?.

- Erê, nepejirand, -Kalo got, û pê re xwe dirêj kire tîrika Kurdekî nêzîk û ji dest girt. - Belê, mirov ev nîv jî ji xwe re ji xwedê xwest,-wî got, û dîsa xwe vemidand.

- Bêdeng ma û li devereke hemberî xwe nihêrî, em ji bîr kirin. Pişt re dest bi axaftinê kir, bê ko berê xwe bide kesekî:

- Mirov sih salên xwe, yê resen, mirovane jiya – dixwar, vedixwar, dikete şeran, di dawetan de xwe dihejand, ji jinên ciwan û keçikan hez

dikir. Lê, pazdeh salên Kerane kar kir, mal da hev. Û pazdeh salên Segane malê xwe parast, bi rûtirşî di ber de reyî, bi şevan xew nekir. Erê, pişt re rahol bû, kal bû, weke wî Meymûnî. Wilo, herkes bi serhejandin bi kalbûna wî dikenîn. Belê Ev tişt tev wê bi serê te bîn,- bi ken Kalo ji Xweşkoko re got, û dûvkê tîrikê di nav diranan re digerland.

- Çima ev yeka bi serê te ne hat? – Xweşkoko pirsî.

- Bi serê min ne hat.

- Çima ne hat?.

- Yê weke min, kê in, -bi tundî Kalo got-. Ez ne bûme Ker, ne bûme Seg, çima ez ê bibim Meymûn?. Ezê li ser çi kal bibim?.

ÎVAN BÛNÎN

Nivîsên berhevkirî di 9 "tom" an de.

Weşanên çanda hunerî /xudojstvinnaya lîteratûra/, Mosko 1966,tom 7.

Î. Gabar

Candar, cada pirê girt, gelek pirsiyar di serî de diçûn û dihatin mîna yek ji tişekî kevin bitirse. Ramiya, bi tirs gavên xwe sist kirin, bi xwe hisya wekî barek mezin li ser milê wî be. çavê xwe bi tûj li ereboka bavê xwe gerand. Dît refê ereba li teniştê cadê reqfîne. Qîrevîra xelkî guhê merov ker dikir.. Werne bacana kîlo bi.....worne moza... worne... mijmija.... Li her kêlîkê polis êrîş li ser ereba dikin. Hineka nêçîr dikin û yên din direvin. Her yek ji wan dilê wî teji xwenin û teji hîvî ne.

Candar ji enstîtote derket ne mîna hrecar. Ji bo karibe arîkariya bavê kal yê ku salan xortanê jê dizî bû bike. Di rê de, soza wî ji hevalê xwe Rêzan re hate bîrê.. kat pênc in.. bi xwe hisiya demjimêr hêdîhêdî dilepîte.! Xuda.. kengî dê bigihem civînê.? Ezê ji wan re gelek

tiştan bêjim.. ezê bêjim... Bi vîzîna turibêleke mezin re hilpekî. Tiştêk nema li bin guha xîne. Tirs Di dilê wî de çû.. sipas ji xudê re.. ez bi zorê jê felat bûm. Rêwiyên bi dilovanî li ruwê wî nerîn.. wê çewa bagerê pêl min kira..?! ezê ji wê civîna giring bimama..! ev gotinên min, yên min xwe amade kirî ez ji hevalan re bêjim wê ketibana zikê kurman... lê, kurm, xwen û ramana dixûn..?

Gehîşt nîzîkî ereba bavê xwe.. mêrek kal di salan de çû ye , xelk li dorê kom bûne, teneghişt yê li erdê bavê wî ye.. xwe bi zorê di nav wan re kir, bavê wî di xwînê de di gevizî û erebe li ser teniştê ye. Xwe avêt ser kelaxê wî. Bav... bav... kê wusa li te kir.. ? Bav.. axaftina paşî ji dêv derket .. wan.. koçikan.. wan.. kurê min ... K..O..!,I,,Ka.

Mihemedê Gavan û Xemo yê Xerzî Du hunermendên jibîrkirî

Samî Ehmed Namî

Meteloka Kurdî
dibêje:
Lihevhatin ji
jêhatîbûnê çêtir e.



Belê rast e, çinko li gor bûyer û serpêhatiyên em wan dibînin yan bi wan re amade ne, gelek caran ferzend dibe yan bûye, hogirên hin camêran wan li ser şanoya rojane û li ber tîrêjên şewqa navdariyê û nasîne datîne.

Li gor dîtina min êdî ew camêr dibe: Heger helbestvan be, dibe mîrê helbestvanan, heger zana be, dibe zanyar û mopêzanê dewra xwe û heger siyasetvan be dibe siyasetvanê tek û tenha.

Bêguman hin zêdekarî di vê qerqêşûna bûrî de peyda dibe, lê dîse jî di bawerîya min de bêtirî wê rast e, bûyerên rojane van tiştan di civatê de eşkere dikin.

Berevajî vê yekê, car carna em dibînin ko gelek kes ji mafên xweyê xuristî bêpar mane û dimînin, ew jî bi sedema ko çerxa felekê li wan berevajî geriyaye û ew nedane ber himbêza xwe û ji nasîn û navdariyê dûr kirine.

Mihemedê Gavan yek ji wan kesan e ko çerxa felekê ew di bin perda nenasîne de bêdeng û veşartî hiştiye. Ew bû, yê ko di nava civata kurdên Sûriyê de û di jiyana huner û strana klasîk a Kurdî de ji wan hunermendên nifşê pêşî dihat jimartin. Ewên ko barekî mezin û giran danîbûn ser milên xwe. Strana kurdî ya kilasîk ji windabûnê parastin û di şevbiwêrkên şevên zivistanan de guhdarên xwe mest û sergerdan dikirin.

Mihemedê Gavan kî bû?

Piştî rawestandina şerê cihanê yê duwemîn, perîşanî û jariyê şaxên xwe dirêjî nava welatên rojhilata navîn, nemaza kurdistanê kiribûn, aloziyên giran konê xwe yê reş ê bêqudoş di jiyana welatîyên wê deverê de vegirtibû û bi sedema ko gelê

Kurd li Kurdistanê bê welat, bê desthilat û bê xwedî bû, herweha ew ji hemiyar bêtir di nava dav û çeperên wê çirava tengasiyê de bi derd û jan hetanî demeke dirêj ma bû.

Gelê Kurd nemaza kurdên ko li herêmên rojhilatî Kurdistanê Bakur dijiyan ew ji her kesî bêtir bi wan êş û kederan êşiyabûn.

Kuştin, talankirin û birçîbûnê gelek kes, malbat û eşîr bivê nevē kiribûn ko koçberî parçên din ên Kurdistanê bibin.

Îsayê Xelef wek kurdekî ko bi derd û êşên wê tengezariyê êşiya bû, naçar bûbû ji gundê xwe Girêmîra – Li qeza Nisêbînê ye- ber bi aliyê binxetê ve koçberî gundê Tilşeîra Aşîta bibe û digel kufletê mala xwe di odekê ji odên xaniyê Mele Ehmedê Namî de bihêwir e, paşî bibe gavanê wî gundî.

Di sala 1934 an de Xwedê ji kerema xwe re kurekî dide Îsayê Gavan, Îsa jî wî bi navê Mihemed binav dike.

Mihemedê Îsa wek hemû zarokên gund jiyana zaroktiyê xwe bi leystik û şevbiwêrkan dibûrand ta ko dibe şeş salî. Êdî bi zarokên hevalên xwe re diçe hicrika Seydayê hafiz Quran, seyda Ehmoyê Xwarzê "Kurdekî ji bajarê Cizîra Botan û ji herdu çavan kor bû, gelek jîr û zana bû, Qurana pîroz û Nûbihara

Biçûkan ya seyda Ehmedê Xanî û hejmarek mezin ji helbestên Melayê Cizerî û Mewlûda Pêxember ezber kiribû".

Mihemed li vê hicrikê dest bi xwendina Quranê, Mewlûda Pêxember û Nûbihara Biçûkan kir, jîrbûn û jêhatbûna wî dikir ko di demeke kurt de Quranê xitim bike û Nûbihara biçûkan ezber bike.

Di dema xwendinê de, hin tiştan bala seyda yê wî Ehmo dikşand, ew jî jîrbûn û jêhatbûn û xweşbûna dengê wî bû. Mihemed bi awazên gelekî xweş elfabêt û Quran û Nûbihar dixwendin. - Xwendin li hicrikên zarokan bi vî awayî bû: Xwendevanên zarok li gel hev, bi awaz û dengbilindî dewr û dersên xwe dixwendin-. Vê yekê dikir ko Seydayê Ehmo dozê li biçûkfeqehê xwe Mihemed bike da bi xwendevanan re dewr û dersan bi wan awazên xwe yê xweş bixwîne.

Lê mixabin bi sedema hewcedariya bavê Mihemedo bi wî û birayê wî yê biçûk Remê ji bo arîkariya wî di gavantiyê de, Mihemedê biçûk bivê nevē dibe ko xwendina xwe li hicrikê rawastîne û bi bav û birayê xwe re bibe gavan. Ji wê rojê bi şûn de ew bi navê Mihemedê Gavan hat naskirin.

Sal, meh û roj bi lez dibûrîn û bi demê re, bê çawa bilbil aşiqê gulê ye, herweha Mihemedo jî dibû aşqê dîlok û stranan, ta ko gelek ji wan ezber dikirin. Li çolê, li ber dewêr bi nehvirandin û carna bi dengê bilin lawik û dîlokên reqsê digotin ta ko bi demê re di stranê de serbest dibû, eşqa strana kurdî bi rewanî di giyanê wî de şax dida û bi wî deng û awazên xwe yên xweş hêrik û newalên çola dora gund sermest dikirin.

Bi vî awayî û bi demê re tûrikê Mihemedê Gavan ji stran, lawik û dîlokên reqsê berxweş dibû û di 15 saliya temenê xwe de Mihemedê dengxweş bi wan awazên şêrîn gelek civat, aheng û şevbiwêrk dixemilandin.

Di sala 1946 an de Eliyê Evdê Ûsiv serokê eşîra Hecîsilêmana li herêma Aşîta, biryara avakirina odekek nû (Koçka mêvanan) li gundê xwe Tilşêrê da.

Di wî çaxî de Xemoyê Xerzî yek ji wan hostayên avakirina xaniyan bû, mirovekî kurd ji xelkê Wanê li gundê Aleqosê herêma Aliyan bi malîti dijîya, bi jêhatbûn, hostayî û stranbêjiyê nav û dengê wî li gelek herêman belav bûbû.

Xemoyê Xerzî ne tenê hostayê avakirina xanî û odan bû

lêbelê hostayê stran û awazên Kurdî jî bû.

Bi wê binavpêketinê Xemoyê Xerzî dibû hostayê oda gundê Tilşêrê, her roj ji serê sibê ta êvarî li kar û xebata avakirinê bû, lê dema şev dihat û reş dikete erdê, kar radiwestiya û demeke xweştir dest pê dikir.

Piştî xwarina şivê û vexwarina çayê û qehwa tal Xemoyê Xerzî bi cilên xwe yên kurdî, bi şal û şapik, bi kum û kolos û gorên xwe yên Mûşî, ciyê xwe yê taybetî di hundurê oda gund a kevin de digirt. Kal û xortên gund bi lez û bez dihatin, berê wan li odê bû, wey li wî ko bikaribe ciyekî xwe di hundurê odê de bigre û di şevbiwêrkê de guhdariya deng û awazên Xemo bik e.

Civata şevbiwêrkê digeriya, Xemoyê hunermend bi deng û awazên xwe yên şêrîn û xweş stran, şer, efsane, çîrok, serpêhatiyên qerhremanan û helbestên seydayê Cegerxwîn, Melayê Cizerî û Mem û Zîna Melayê Xanî bê westan tanî derengî şevê digotin, ji wan stranên herî bi nav û deng, strana Şîniyê bû, şîna kuştina kal û pîran, xort û keçên ciwan, mêr û jin û zarokên kurdan li Geliyê Zîlan bû, ewên ko bi biryar û destên Toraniyên faşist hatibûn qirkirin.

Di wan şevbiwêrkan de Xemo guhdarên xwe sermest û sergerdan dikirin.

Mihemedê Gavan wek hemû xort û ciwanên gund dibû yek ji beşdrên wan şevbiwêrkan. Li gor gotinên rastgoyan, cîgehê Mihemedo her û her li pêşberî Xemoyê dengbêj bû, da bi her pênc pêhisiyên xwe bikaribe guhdariya hunermendê mezin bike, gelek ji wan stran, dîlok, efsane û çîrokên ko Xemo digotin, Mihemedo jî wek rêkorderê di mêjiyê xwe de û bi wan awazan ew tomar dikirin.

Hunermendê me Xemoyê Xerzî ne tenê hunermend bû, lêbelê kurdekî walparêz bû, li gelek hêrêmên Kurdisanê bi sedema karê xwe geriya bû, di wan şevbiwêrkan de cugrafi û dîroka Kurdisanê ji guhdaran re şirove dikir, kurdayetî jî bi xelkê civatê dida nasîn û bi wan xweş dikir, doza hezkirina welat û milletê Kurd li wan dikir

Dostaniyek gelek xweş û germ di navbera vî hostayî û van herdu helbestvanan de, seydayê Cegerxwîn û seyda Ehmed Namî de hebû, lewra sedayê Cegerxwîn wî wek hunermendekî welatperwer pesindar dike. Xemo gelek helbest û ristikên dîwana "Pirîsk û Pêtî" a seydayê Cegerxwîn ezber kiribû û di wan

şevbiwêrkan de digotin. Seyda jî di helbesteke xwe de weha li ser dibêje:

Hêviya Dijmin

Piştî şerê Ararat

Bi ser Kurd de hat

Zar û zêç û mêr û jin

Ketin nav lepê dijmin

Dibên çil û heft hezar

Hemî reben, tev hejar

Ajotin Gelyê Zilan

Hemî dane ber gulan

Lê serdaran çil keçik

Keç û bûkên pir xweşik

Pirê wan bûk û qîz in

Da ko bi wa bilîz in

Lê xwe avêtin avê

Go: Ev pîsî me navê

Stranek li ser çêbû ye

Bi dilşewat lêbûye

Xemo ji bo me digot

Dilê civatê disot

Çav li serî sor dibûn

Na, ez şaş im, kor dibûm

Rondik ji wan dibûn rêz

Wî xem dikirin hembêz

Xemo welatperwer bû

Dîwana min jiber bû

Lê ko rûdinişt, digot

Zû pertalê xwe difrot

Pertal welatperwerî

Ne qumaş û ne hirî

Herkes dixwest bibênî

Bihna xwe pê derênî

Xemo, bi xem dilbirîn

i dîwana Cegerxwîn

Gelek ristik jiber bûn
Bi axîn û keser bûn
Ji Kurdan re wî digot
Dil û hinav li wan sot
Mirovekî karker bû
Şal û şapik li ber bû
Bi şal û kum û kolos
Gelek diçû Aleqos
Vê paşiyê çû welat
Lê nizanîm çi pê hat?
Min pir li wî dipirsî
Ne carekî, sed û sî
Dibêjin hêjî sax e
Bê xanî û qûnax e
Heta par jî hê xweş bû
Li welêt bû, rûgeş bû (1)
Xemo yê Xerzî û Êsivê Hedad.

Êsivê Hedad, mirovekî siryanî ji xelkê Qamişlo bû. Di destpêka jiyana xwe de hesinker bû, bi kar û xebata xwe bûbû yek ji maldarên mezin li bajêr.

Di salên çilî de Êsivê Hedad avahiyê digel sînemayek li taxa navîn li Qamişlo avakir. Xemoyê hosta wek ko hosta û stranbêj bû wilo jî şewekar bû, û bi sedema ko ked û xebata wî di avakirina vê avahiyê de hebû, diyarîyekê pêşkêşî wê pirojeyê dike.

Diyarî jî, mînakek ji dara Gûzê bû. Mînak wek mirovekî kurd, simbêlboq, bi şal û şapik, bi kum û kolos û bi sola sor bû, di destekî de şûr û di destê din de mertal bû.

Ew mînak li ser serê qesrê hatibû çikandin, dema mînak ber

bi ba dibû ew mirov li hev dizîvirî, şûr û mertal di destên wî de bilind û nizim dibûn wek şervanekî ko bi şûr û mertal şer bike. Xweş tê bîra min ta salên pêncîyan jî ew mînak li ser serê wê qesrê dima.

Karê avakirina koçkê çend mehan dirêj kir û bi dawîhatina avakirinê hosta û hunermendê me yê bi nav û deng Xemoyê Xerzî xatir ji gundiyan xwest û vegeyriya gundê Alaqosê, tê gotin ko piştî demekê vegeyriya Wanê û li ciyê bav û papîran cîwar bû.

Di 20 saliya temenê xwe de Mihemedê Gavan wek mamostayê xwe Xemo yê Serhedî stran, lawik û dîlokên reqsê digotin. Hunerê bi giranî hêlîna xwe di mêjî û giyanê wî de çêdikir, li çolê li ber garana dewêr, di ber cot re her û her stran û dîlok digotin. Bi demê re, bi wî deng û awazên xwe navdar dibû û hunera wî bi rewanî û bi gavên fereh bi pêşve diçû.

Vêca em karin hunra Mihemedê Gavan bi du cureyan bidin ber çavan.

1- Stranên şeran, efsane, çîrokên dirêj, pesindarî, bîranîna şehîdan û yên devjeniyê.

2- Lawik, dîlokên reqsê, paleyê, dankutê û destarhêrkê.

Wek nimûne:

- Şerek di pesnê malbata Bedirxaniyan û Şaneşîna Botan de.

- Şerê Dêrûnaqulingan ya sala 1956 an di navbera kurdên binxetê û leşkerê Tirkan de.

-Strana Celalê Haco.
-Strana Hesenê Amerê Helîmê, bi rengê Şano.
-Stranên folklorî, yên hemereng. Herweha stranên ko bi wan navdar bûbû ev bûn:

Sofi, Evdalê Zeynê, qulungo, Birahîmê Gijal, Şem`ûnê Henê Heydo, siwaro, stranên folklorî, klasîk û komîdî. Hin ji wan dîlokên li ser zimanê lawiran bûn, wek dîloka: Hey rovî rovî rovî hewlile...û hwd.

Hejmarek ji van stran û dîlokên vî hunermrdî, radyoya kurdî ya Qahîreyê (li Misirê) di salên 1958-1967 diweşandin.

Di biharekê ji biharên salên pêncî de, Êsivê Haco Axa şevbiwêrkeke hunerî li bajarê Tirbespiyê, li oda mala Haco lidar xist, stranvan û hunermendên herêma Aşîta û Cerihê yên beşdarê vê ahengê ev bûn: Mihemedê Îsa yê Gavan, Remoyê Dengbêj, Silo koro, Evdilewo, Brahmê Mitirb û Leto yê Şexo yê Nado(şanogerekî gelêrî bû) û ...hwd.

Bi stran û dîlokên rengereng û bi arîkariya mûsîka tembûra Êsivê Haco û kemança Brahmêko hunermendên beşdar aheng germ û xweş dikirin û şevbiwêrk bi wan stran û awazan germ û xweş dikirin.

Ahengê ta derengî şevê berdewam dikir û li dawiya şevbiwêrkê, xelat hatin belavkirin, xelata biserketinê di warê strana û dîlokan de dibû para Mihemedê Gavan.

Digel ko hunermend Mihemedê Gavan endamê partiya Komonîst a Sûrî bû herweha ew mirovekî walatparêz bû, gelek caran di civatan de digot: Bi navtêdana van kesan seydayê Cegerxwîn, seydayê Ehmed Namî û mamostayê min Xemoyê Serhedî ez bûme kurdperwer.

Lê mixabin jiyana aborî ya hunermendê me wek her hunermenkî Kurd ta demekê bi jarî û xizanî dihat bûrandin, digel ko rojekê bê kar nedima û nema bû, karê gavantî, şivantî, Rêncberî, cotkarî, barkêşî, paleyî û karê li ser patozan dikir, lê digel vîqasî jî jiyana wî ya aborî xweştir ne dibû û ji naçarî bi malîtî ji gundê Tilşêirê koçberî gundê Ricimeyar dibû –gundekî kurda li herêma Tilelo ye – û li wî gundî bûbû muntefî`e – xwedî

qad û zevî- û bi vê yekê jiyana wî ya aborî xwaştir û baştir dibû.

Li gel van hemû aloziyan Mihemedê hunermend rojekê ji rojan rê neda ko kêmasiyek yan dûrketinek têkeve karê wî yê hunerî, her û her bo pêşxistin û nûkirina hunera xwe berdewam bû.

Berhemên Hunermendê me ta sala 1965 an gihîştibûn 10 kasêtên tomarkirî yên rengereng. Bi sedema hin bûyerên xirab û li gor gotina malbata wî, hinek ji wan kasêtan hatin winda kirin û li gor gotina hunermendê me dema dibêje: Sedema herî giring ji wê talana min a mezin re ev bû: Min dîlokeke rexneyî, devjenî di derheqê hin kesên ne kurdperwer de wek: (.....) gotibû û tomar kiribû, û karên wan ê xirab di rêça xebata millet û gelê min ê Kurd de, bi wê sedemê ew felek û talankirin hate serê wan berhemên tomarkirî.

Lê dîse jî kasêtên wî yên ji ber talanê filitîbûn li gelek tomargihan wa tên firotin.

Mixabin di rojekê ji rojên payiza xemgîr ya sala 1977 an de, Hunermend Mihemedê Gavan ji bo çêriya pezê xwe vedigere gundê Tilşêrê û di êvara 1977.10.17 an de dilê hunermendê me, ew dilê ko di jiyane de her şad û kêfxweş bû ji nişka ve rawestiya û dengê wî yê ko xem û derd û êş ji dilan direvandin bi carekê hate birîn û çû ber dilovaniya Xwedê û li gundê Tilşêre hate veşartin.

Hêvîdarim ji Yezdanê pak û dilovan, hunermendê me yê hêja Mihemedê Îsayê Gavan bi rehmeta xwe şak e.

Stockholm. 2002.

- Hevpeyvîn digel Mihemed Elî kurê hunermend Mihemedê Îsayê Gavan û malbat û hin kesên heval û dostên hunermend li bajarê Qamişlo.1998.10.05 --- - Guhdarîkirina berhemên wî yên tomar kirî.

- Hin bîranînên min li gel Xwedê lêxweşbe.

(1) Ronak – Cegerxwîn, dîwana Çaran, rûpel 20, çapa yekem - - Weşanên Roja Nû. Stockholm 1980.

Pirs - hejmar - 38 – rûpel -----

39

Pirjinî û belayên wê

Deqek vebjartî ji *Rojnameya "Roja Nû .

Vebjartin: B.Dara

Nexweşiya pirjiniyê di nav hemî mislîmanan da, nemaze di nav me kurdan da gelekî reh û rîç berdane erdê. Li nik hinekan pirjinî tiştek ji mêranîyê, bi çav hinekan jî kêfek ji kêfan e. Ma gelo tu bê ramana van celeb mirovan e bi çi ye?. Bersiva vê pirsê, bê şik, ji "no" yeke botanî pêva nîn e.


Ji jinekî pirtir anîn, ji malkambaxiyê pêva ne tiştek e. Berî her tiştî civîna du jinan di himbêza mêrekî, an di bin banekî da ji ber sebebên jêrîn, çira bextiyariyê di nav wê malê da vedimirîne.

1.Ji ber dexsa hewiyan lec û qirên di nav malê da kêma nabe ko bi vê yekê rihetiya xelkê malê bi carekê direve.

2.Mala ko lec û qirên tê da kêma nebe, bê şik ji xêra Xwedê bê par dibe û roj bi roj ber ve xirabûnê diçe ko bedbextî di wir da dest pê dike.

3.Ne mikûne ko kurên hewiyan ji hev hez bikin, ji vê jî dubavî dikeve nava biran. Hatiye dîtin ko pir caran ji vê dubaviya han neyarîne bê eman hatine pê.

4.Ji ber rik û dexsê, hewî ji bo serdestiya li ser berbera xwe hînî derew û bêbextiyan dibe ko bi vî



Osman Sebrî

awayî gewherê xwe ê hêja winda dike. Jina ko dakete vê kortalaha kirêt, êdî ew ji mirovekî pirtir, dibe rawireke dirende.

Ev in hinek ji belayên ko ji pir jin anînê tîn!... Hemberê van belayên han, kes nikare ji me re qenciyeke pirzewacê rave bike.

Heye ko hinekên ne serwextê-rastiye bêjin: Heke pirjinî ne çak bûya, an tiştekî ew çend î kirêt û bê rê bûya, teqez Xwedê di Quranê da rê ne didan!...Berî her tiştî ên ko dixwazin vê yekê bêjin, divê qenc bizanibin ko Xwedê herwekî ew dizane emir nekiriye. Xwedê di Quranê da dibêje:"Heke hûn dikarin di navbera wan da wekhevîyê bînin pê, dudu, sisê û çar jin anîn ji we re durust e. Na ko hûn nikarin wan weke hev bigirin, yeke bi tenê ji we ra bi xêrtir e".

Ez dibêjim kes nine ko bikaribe bêje: Ev yeka han bi min dibe: anê" Ez dikarim di navbera du jinan da wekhevîyê bînim pê". Çima ko bicihanîna vê gotina Xwedê gelekî dijwar e. Dîsa divê neyê ji bîrkirin ko dema va ayeta han daketî, di nav Ereben ko quran bi zimanê wan hatî da, tolazî bi awakî kirêt belav bû bû. Hîngê ji vê tolaziya han du belayên mezin kiyânê civata beşerî dihejand in. Yek ji van nexweşiya ko di riya tolaziyê da li nav xelkê belav dibûn, a duduyan, pîrbûna zarokên bêbav. Ji bo ko pêşiya van herdu balayên han bête girtin, bi şertê ko di navbera hewiyan da wekhevî bête pê, Xwedê rê daye. Heke ne ji ber van sebebên han be, ew yeka ko mirovên dilçak û dilovan qîma xwe pê nînin, çawan Xwedayê rast û rihniyê pê qaîl dibe.

Ên ko di anîna çend jinan da çakiyekê dibînin, an vê kira han tiştê kirêt nizanin, teqez ew jinan weke xwe mirov nizanin, heke em hîn rastir bêjin, ew jinan weke dewaran dihesibînin. Ji xwe jina ko bi çûyîna ser hewiyê, an bi hatina hewiyekê qîma xwe bîne, ji dewarekê pêva ne tiştê e. Ez dibêjim, ji mirovekî aqilmend ran e hewceye ko ji

dewareke duling hêviya anîna kurekî hêja bike...

Îro ji me kurdan ra divê ko em di vî ware han da çavên xwe vekin û bi riya pêşiyên xwe da neçin. Em keçên xwe weke dewaran nefiroşin û wan hildin cihê mirovatîyê. Ew keçên ko dê sibe bibin diyên zarokên me, îro me çiqas qedra wan girtibe, ew qedir ji bo zarokên sibe ye.

Jinek bêbext û derewîn kurekî rast û bi bext nayê dine. Bela nezanî, bêkêrî û xirabiya me, ji nezanî û bê qedriya jinan tê." Jinên miletekî mîzana serbilindî û pêşveçûna wî miletî ne". Dil dixwaze ko xortên kurd vê yeka han bidine ber çavên xwe û riya pirzewacê li pêş kesên ko dixwazin pê da herin bigirin. Divê xortên gelparêz ji bîr nekin ko ji bo gîhandina cîlekî çak ew hewceyê dêne hêja ne, diyeka hêja ew e ko berî her tiştî bizanibe ko miroveke û di jînê da wekî mêrekî xweyî heq e. Hîn piştî vê ye ko ji bo her diyekê xwendin û zanîn divê.

***Rojnameya "Roja Nû"-
Hejmar-17-sal(1)-23
Tebax1943**

Çiyayê Lêlûn di nînika Merwan Berekat de

Pirtûka ((Çiyayê Lêlûn di nînika dîrokê de)), pirtûkeke nû ye li ser perçakî ji navça Efrînê hatiye nivîsandin. Mamoste Merwan Berkat ew çêkiriye.

Pirtûk di sala 2006 an hatiye çapkirin. Pelên wê ji pîvana orte ne /20*14/ cm. Ew ji 240 rûpelan pêk hatiye. Wek li ser qaba hundur hatiye nivîsandin, pirtûk ((lêkolîneke ciyolocî, dîrokî, şûnwarî, civakî ye belgekirî ye)).

Pirtûk bi şeweyê klesikî nehatiye dabesh kirin, tenê navnîşanên qaling û bendikên wê di bin re hatine rêzkirin.

1. Wateya navê Lêlûn, 5rupel in.
2. Bingeha ciyolocî ya Ç.Lêlûn, 12rup.
3. Xaknêgariya xwezayî, 17rup.
4. Ç. Lêlûn di îrokê de, 15rup.
5. Jiyana olî li Ç.Lêlûn, 44rup.
6. Şûnwarên girin û şengehên Ç.Lêlûn, 69rup:
7. Rêkên kevin li Ç.Lêlûn, 2rup.
14. Geştevanî li Ç.Lêlûn, 1rup.
8. Sedemên malbarkirinê ji Ç.Lêlûn, 3rup.
9. Ziman li Ç.Lêlûn, 1rup.
10. Adet li Ç.Lêlûn, 5rup.
11. Jiyana aborî li Ç.Lêlûn, 5rup.
12. Rêk û rewşa çûnhatinî li Ç.Lêlûn 2rup.
13. Geştevanî.

Erê gelek zaniyar, lêkolênvan û rojhilatnasan li Ç. Lêlûn lêkolîn kirine û nivîsar weşandine, lê digel ku hin zanişwer di pirtûkê de bikurtî hatine nivîsandin û şrovekirin, lê şamîkirineke vê pirtûkê ya şêrîn heye, dihêle mirov wê ji rûpela destpêkê ta ya dawiyê bixwîne.

Birastî ev pirtûka yêkê ye ku wilo bi hûrikî û bi ferehî li ser Ç. Lêlûm daxive. Hêjayî gotinê ye, ku rêzdar M. Berekat bi xwe ji Ç. Lêlûn e, li gundê Soxanekê hatiye dinê û lê dijî. Ji ber wê jî, ew li deverên çiyayê xwe kevir bi kevir, mit bit mit, şikêr bi şikêr, bost bi bost geriyaye, û mirovên herêma xwe yek bi yek nas kirine. Bêguman wî şûnwarên Ç. Lêlûn jî yek bi yek dîtine, kevir bi kevir çav lêkiriye.

Birastî hêjayê ye ku pirtûka "Çiyayê Lêlûn" ji hêla her kesî ve were xwendin, û di her malekê û pirtûkxanekê de were dîtin.

pirs - 30.4.2007

Name û birûsk

Ji Hevgirtina Rewşenbîrên Kurdên Rojava li Derve, ji kovara Pirs û rojnama Newroz re:

Wê ji 28-30.04.2007 Kongireya sêyemîn a Hevgirtina Rewşen -bîrên Kurdên Rojava li Derve li bajarê Göteborg- Swêd lidar keve.

Emê pir kêfxweş bin ku em têbînî, pêşniyar û birûskên we di dema pêş de werbigrin.

Bersiva Newroz û Pirsê

Komîteya Ragehandinê ya Hevgirtina Rewşenbîrên Kurdên Rojava li Derve..

Hevalên berêz.. Dema we hemiyar xweş be.

Em kongira we ya sisîyê pîroz dîkin û serkeftin û bextewariyê ji we re dixwazin.

Hevkarên hêja.. Gelek rewşenbîrên me hema dema ku bask pê dikevin, difirin diçin li (xakbuhîsta) Ewropa dijîn, ev jî ziyaneke giran digihîne civaka me li welêt. Ji ber ku damezrandina civateke hevgirtî, berhemdar, pêşketî û azad, berî gişan bi raman û keda rewşenbîran pêk tê. Du hêviyên me ji kongira we hene:

Yek: Deng û berhemên we bigihên mirovên me li welêt.

Didu: Bi pênûs û ramanên xwe alikariya weşanên ku bi Kurdî li welêt derdikevin bikin.

We hemiyar silav dîkin, Serkeftin ji kongira we re.

Desteyên birêvebir ên:

Kovar PIRS Rojnama NEWROZ.

EFRÎN 18.4.2007

Bersiva HRKRD

Brêvebirên Pirs û Newroz .. Silavên germ..

Em bi navê hemî komîteyên HRKRD-yê û bi navê endamên xwe û beşdarên kongireya sêyemîn a Hevgirtina Rewşenbîrên Kurdên rojava li

derve, spasîyên xwe yê germ û dilsojane aresteyî we dîkin.

Piştgirî û helwesta we ji boyî me cihên serbilindî û şahnazîyê ne.

Li gel rêz û silavan

Komîteya amadekirina kongireya sêyemîn a Hevgirtina Rewşenbîrên Kurdên Rojava li Derve.

19.4.2007

Pirs - hejmar - 38 - rûpel 43

Nivîskar û xwendevanên giranbuha..

i. Em hêvîdarin, win deqên resen bi deqên xwe yên wergerandî re bişînin. Eger deqên bi zimanê resen negihên me, em lêbiborînê ji bo neweşandina wergerên we dixwazin.

ii. Ji bo ti nivîsar ji weşandinê bêpar nebin, hêvîdar in kesên ku nivîsarên xwe li ser (ê mêla) Pirsê dişînin, navê xwe di bin nivîsara xwe de binivîsin.

iii. bêguman her belavokekê nêrîn û armancên xwe hene. Ew ji bo pêkanîna wan, pilana xwe datîne û dixebite. Me jî, ji bo hêskirina karê xwe naveroka kovara xwe ((Pirs)) wiha parve kir, hêvîdar in têde bextewer bin:

- Pêşgotina hejmarê
- Gotar, lêkolîn, raman, dîrok...
- Ziman, deqên vebjarte, bêjeyên herêmî, ango her tiştê ji zimên re sêdar be.
- Hevpeyvîn.
- Danasîna herêmên Kurdistan (war, mirov, çi kevin, çi nû...)
- Wêje û huner: lêkolînên hunerî û wêjeyî.

çêrok: yên nivîskarên Kurd û yên wergerandî.

Helbest: ên hebestvanên Kurd û yên wergerandî

- Pirtûk: Danasîn û nirxandina pirtûkan.

- Kelepûra Kurdî: çêrok, metelok, serpêhatî, bawerî, stran, cil, pêkenok..

- Name, daxuyan, nûçeyên demsalî yan ên salane yên girîng.

- Têbînên Pirsê û têklî bi xwendevanan re

Pirs.



Ji pêkenokên rast

Gotariyek ji gundên
Meydana herêma
Efrînê hebû.
Pisîkek(kitik) xwe hebû.
Pisîyê çêlikên mirîşkan
dixwerin. Ew pê re hosan
bibû. Nizanî çi çareyê lê bike.
Li wê herêmê kuştina pisîkan
heram e, ji ber wê nikarî ew
bikuşt. rojekê di ber cot re
ramanek hatê. Wî siba din
pisîka xwe girt, kir telîzekî,
dev girêda û bi xwe re bir. Li
ber cot, çend sêxilcan (zov)
kom kirin, bi nexekî zirav û
dirêj ve girêdan û li ser axa
ajotî danî û xwe da bendê.
Leklek li wir pir bûn dihatin
çêrê, yek ji wan hat sêxilcan
nikil kir û tev serê nêxê
dadiqirtand. Wê hîngê Wî bi
serê nêx yê din kşand ta Lelek
girt. Piştî, rabû pisîka anî li
ser piştî Leklek girêda, tepa
xwe li piştê xist û got: Xwedê
bi we re be û balinde berda.
Her pisîk dîkir new – new,
hêz dida xwe û bazik li xwe
dixistin û bi bani diket, û wisa ta
Leklek tevlê pisîkê di ezmên de winda dibû.

Danhev: Zamdarê Zindî

Cêrokên Gelêrî

Tajî û Mamêza Kovî

Rojekê nêçîrvanekî
Tajiyê xwe derxist nêçîrê.
Piştî rêçûn û lêgerînê,
Mamêzek Kovî bi pêş wan
ket, nêçîrvên bilez Tajî ji
bên rizgar kir. Tajî bi
navtêdan û qîrîn da pê Kovî.
Piştî bez û revînê wan gelî û
newel dan ser hev, kaşekî
asê ket pêş wan, Mamêz
hilperikî bi jor ket. Li paş
xew nihêrî dît ku Tajî
rawestiyaye, ziman dirêj
bûye, navkelên wî hiltên û
datên.

Mamêzê dengê lê kir
got:

" Birayê Tajî.. Tu nagihê
min, ji ber ku beza min ji bo
feryad û xelasiya min e...!
Lê te ji bo kê daye pê min?!"

Danhev: Ciwan Şeranî

DÊM QURNEFÎLÊ


MERWAN BEREKAT

Ey vîn revîna min
Min ji min nepirse
Di xwe de ,
Li min bigere
Xwîna dilê eşqê me
Di rehên te de wenda me
Ken im
Girî me
Xeyd im ...
Şahî me ...
lêdana yekê ..
Ji lêdanên dilê te me .
Di piyala evîaê de
Meya eşqê me
Li ser maseya rojê,
Li benda tîbûna lêvên te me.
Bîna qurnefîlên dêmên te ,
Û xûdana memikên te me .
Dêm qurnefîla min ..
Di şevên te de ,
Xewneka dînokim
Sîmfonîya derdên dil im
Girûziya can ,

û bawişka sîngê te me .
Li ser pel gulên lêvên te
Wêneyê maça dawiya şevê me
Perwan im ..
Perperîk im ..
Her li dor agirê evîna te me.
Ey finda jiynê...
Ji neyloferê re
Hêdî pêl divên
Ji sêvan re
Palandin divê
Ji porê zêrîn re,
Berbiskên zîvî
Û bîna filan divên
Ji derd û kulên dilê min re ,
Çend ramûsan,
ji lêvên tengij divên .
Ey dêm qurnefîlê ...
Ji canê min re
Goreka ebedî
Di dilê te de divê
Sûnd bi gora evîdaran
Bi navê pêxemberê evîndariyê
Dil û can ew ê bimînin
Dîlê evêna te... ey vînrevîna min.

Birîn

*Kaxez di bin birînê de raziye
Keşta birînê
Û dema westyayî serbilindiya birînê ye
Û dara ji bijangên me bi derketî
Golek ji birînê re ye
Û birîn di piran de
Gava tirbe dirêj dibe
Gava aram dirêj dibe
Di navbera kenarên evîn û mirina me de
Û birîn nîşan dike
Û birîn di derbas bûnê de ye
Ji zimanê zengilên xwe etisîne fre
Dengê birînê didimê
Ji kevirê ji dûr ve tê re
Ji cîhana hişk bûyî re
Ji hişkiyê re
Ji dema di erebana qermîtkê de
Agirê birînê pêdixim*



Edonîs

Wergerandin ji Erebî: Mihemed Qere Hesên